



Ismail Gôldaş der bare
gerê de ji me re nivîsano

Gerêke astengkirî û qedexekirî

Ji celadekî
îtirafên balkêş
û girîng

Rûpel 6-7


Auschwitza
kurdan:
Newala Qesaban

Rûpel 16

Yek ji
dengên heviyê:
Kovara Rojî Kurd

Rûpel 11

NAVEROK




4

Mehrdad R. Izady: Rewşa îroyîn a dîroknavîsîna kurdî (3)



10

Dildar Şeko: Di zimanê biyan de awazên kurdî



12

Xêlya: Kurteçîroka Tunebûn, 'tenêbûn tunebûna min e'

Ji Xwendevanan


EZ ji hejmara yekemîn heyani niha, hemû hejmarên Azadiya Welat taqîb dikim. Lê wekî ku tê zanîn dijmin, li her çar hêlên welêt, em ji zimanê zikmakî bi dûr xistine. Ji ber ku zimanekî neteweyî were afirandin; rojnameya Azadiya Welat, kovara Rewşen û MED TV roleke girîng dilîzin. Ji ber vê yekê jî xebatkarên Azadiya Welat re dibêjim, hûn di her hejmarekê de koşeyekê bidin ferhengoka kurdî, ji bo ku em hîn xweşik hîni zimanê xwe yî zikmakî bibin.

Silav û hurmetên xwe yên şoreşgerî ji hemû xebatkarên Azadiya Welat û xwendevanên wê re dişînim.

ALÎ AYDIN/
GIRTÎGEHA BARTINÊ

ROJBAŞ xebatkar û rewşenbîrên Azadiya Welat, min piştî hejmara yekemîn ji we re nameyek şandibû ji bo pîrozbahîya rojnameyê. Dîsa jî derketina rojnamê li hemû gelê me pîroz dikim û serkeftinê ji wan re dixwazim û daxwaziyeke min ji we heye, di quncîka xwendevanan de bi alîkariya we, ez silavên germ û ji dil, ji girtiyên zindanan re dişînim û doza wan silav dikim.

SALÎH DEMİR



Rewşa Tirkîyeyê û HABIATAT'a fermî

MEHMET GEMSİZ

L i Tirkîyeyê buhrana hikûmetê êdî xwe daye der. Pişkdarên hikûmetê Mesut Yılmaz û Tansu Çiller bi ser hev de diçin. Der barê nelirêtiyên Çillerê wekî TEDAŞ û TOFAŞ'ê de tehqîqat hatin vekirin. Pişt re skandaleke din a Tansu Çillerê derkete holê, bi navê xezîneya veşarî; ku bi osmanî jê re tehsîsat-ı mesture tê gotin. Em jê re bi kurmancî dikarin bibêjin "terxaniya nepenî."

Tansu Çillerê 22 roj beriya ku serokwezîrtiyê bispêre Mesut Yılmaz 500 milyar jê kişandîye. Mirovekî bi navê Selçuk Parsadan 5.5 milyar (bi du caran) jê standibû.

Pêşî Çillerê ev yek qebûl nekir. Piştî ku her tişt eşkere bû, kete tengasiyê, neçar ma li xwe mikur hat. Îcar daxuyand ku wê peryên ku ji "terxaniya nepenî" kişandîne, ji bo berjewendiyan neteweyî yên bilind xerc kirine û ev sira dewletê ye nikare bê eşkerekirin. Eger bê gotin 5 sal cezayê wê heye. Lê Mesut Yılmaz pê da ser û jê xwest ku qet nebe divê wê sirê ji Serko-

mar Demirel re bibêje. Demirel xwe neda berê. Tansu Çiller îcar dadixuyîne ku ew bi Mesut ewle nabe. Heta pê de çû û got ku Mesut Yılmaz, di bin re xeber şandîye ji Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan. Jê re gotiye hay ji xwe hebe, Tansu dixwaze te ji navê hilîne.

Ji hêla din ve, DYP'ê der barê hebûna malên Serokê Partiya Refahê Necmettin Erbakan de daxwaza tahkîqat da meclîsê. Lê ev tev de hiştin piştî hilbijartinên cîgahî yên navberê.

Digel van qewmîn û rûdanan, hikûmeta "ANAYOL"ê di 26'ê gulanê de civîna Heyeta Wezîran li Amedê pêk anî. Lê ji bilî du wezîrên DYP'ê Ayvaz Gökdemir û Ünal Erkan, ku ji wezîrtiyê îstîfa kiribûn, 4 wezîrên DYP'ê, yekî ANAP'ê tevî civîne nebûn. Di çapemeniya tirk de hate xuyakirin ku hikûmet bi ahengeke têr baş biryaran îmze kirine û xebitîne. Belê, ev yek jî we tevan re eşkere ye ku tê çi maneyê.

Em vê jî bibêjin ku, der barê helkirina gelşa kurdî de tu tiştêkî nû neqewimî. Ci-

vîn tenê bi navê xwe ma. Digel agirbestê, biryarên dewamkirina şer hatin standin.

Tiştêkî girîng jî ev e; vê hikûmetê temenê xwe tijî kiriye. Di pey hilbijartinên 2'yê pûşperê de qewmînên nû li pêşiya me ne.

Bi van qewmîn û bûyerên li jorê re, di navbera rojên 3-14'ê pûşperê de li Stenbolê çalakiyên HABIATAT'ê dest pê dikin. Ev a fermî ye. Ji aliyê din ve 33 partî, rêxistin û saziyên sivil li dijî wê çalakiyên alternatîf pêk tinin, di nav rojên 2 û 8'ê pûşperê de.

HABIATAT, cara pêşin di sala 1976'an de li Kanadayê çêbû. Armanca wê ew e ku mirov di nav xanî û siruştêke bisihet de bijîn. Digel ku biryara Neteweyên Yekbûyî heye, cihê ku li şer û pevçûn hebe, aşî nebe, divê civîna HABIATAT'ê lê çênebe.

Ev konferansa li ser bicihbûna mirovan a duyemîn li Tirkîyeyê çêdibe. Dewlet bi awayekî wisa tevî vê konferansê dibe ku tu keysê nade partî, rêxistin û saziyên dijber. Ne tenê kurd, hindikahî jî (mîna rûm û ermen) bi şeweyeke fermî beşdar nabin. Rê li ber wan hatiye girtin.

Heta li ser serên gotinbêj û beşdarên HABIATAT'a fermî, qanûnên 8/1 û 321, da-leqandî ye. Dibêjin ku "şanên baranê ewr û yên mirinê jî ba ye." Ev gotin li dimena Tirkîyeyê xweş tê.

Zarokên welatê rojê

D i serê gelan de çawa rista xort û pîrekan heye, ew qas jî ya zarokan heye. Lewre ew ji rojên pêş re her dem hêvî ne û ji bo cîhanê neke wekhev û aştiyane ronahî ne.

Mêjî û rizgîn (hest) ê zarokên welatê rojê, wekî avzêmen bihar û payîza çiya derdibin û di deşt û newalan de diherikin ser çem û robaran; zelal, spî û nazik in; mîna parparê û kidatkên nav berfa çiravê de şin dibin, taze û paqî in. Zarokên welatê rojê, li bihuşa ser rûyê cîhanê bûne û çavên xwe vekirine. Lê belê, di nava vê bihuştê de jiyân ji wan re bûye wekî dojhê. Lewre di wê bihuştê ev qas xweş û ronahî de, her der tarî û qetran bû, çav çavan nedidit.

Mirovên di vê bihuştê de jîn dibûn, xwe nas nedikir û ji xwe "Ez kî me, ji ku hatime?" pirs nedikir. Lewre dijminê kedxwar çavên civatê tirsandibû. Ji bo ku hebûna xwe di welatê rojê de bide meşandin û civakê pijvîn bike, berê xwe da zarokên welatê rojê û bi ser zarokên xwedî mêjiyê nazik û taze ve çû. Mînak: Hêzên kedxwar di dibistanan de, bi talimên xwe yên kevnepêrest mêjiyên zarokên welatê rojê tijî çanda şewş (xurifî) dikirin û nava wan vala dikirin.

Belê, berî ku di welatê rojê de şerê azadiyê dest pê bike, wekî rewşa tevî gel, a zarokan jî gelekî xerab bû. Lewre, hem nexweşiya eşa giran a kemalîzmê ketibû nava mêjiyê wan û hem jî, ji jiyaneke birûmet dûr ketibûn. Ji ber vê yekê zarokên welatê rojê, di civakeke tebatî û bêrêxistin de mabûn û ji aliyê din ve jî, bêxwedî û bêserî mabûn. Ji bêçareyî ketibûn ber sekerata mirinê.

Ji bo vê eş û nexweşiyê ku ketibû nava dil û mêjiyên zarokên welatê rojê bêguman gelek ên ku ji xwe re digotin hekim û bijîşk

Bijîşkekî zanyar û mezin rabû, civaka kurd ji xewa giran rakir û îro jî ew anîne qonaxa rizgariyê. Bijîşk lêkolîn û lêgerînên xwe li ser dermanê nexweşiya gelê welatê rojê kir û navê danî bîrdozî.

HAYRETTİN DÜNDAR

derketin pêş. Lê mixabin tu bijîşk ji eş û nexweşiya zarokên kurd re çare û derman nediditîn. Lewre rêbazî û timarên wan ne zanistî bûn.

Belê, nihayen bijîşkekî zanyar û mezin rabû, civaka kurd ji xewa giran rakir û îro jî ew anîne qonaxa rizgariyê. Beriya hemû tiştî, bijîşken mezin û zanyar lêkolîn û lêgerînên xwe li ser dermanê nexweşiya gelê welatê rojê kir û navê derman danî bîrdozî. Ew bijîşkê mezin û zane di wan derfetên qut de, bi fedekariyê mezin nexweşiya gelê welatê rojê baş fêm kir û dest bi timara gelê welata rojê kir û rakir ser piyan.

Belê; îro zarokên welatê rojê, gelekî nexweşî, tengî û di nava belengaziyan de ne. Lê belê dîsa jî ne westa ne û ne tirsîyane. Lewre êdî di nava jiyaneke nû û di nava têkoşîneke birûmet de dijîn.

Her roj li hemberî çavên zarokên welatê rojê, xwezayî; gund û bajar tene wêrankirin û bombekirin. Dîsa dijminê xwînxwar li ber çavê wan dişewitîne, dayik, bav, xwişk û birayên wan û serê hevalê wan jê dike. Ji ber vê yekê zarokên welatê rojê, li hemberî dijmin, dilê wan tijî kîn û nefreta dijmin bû-


ye û di vê rewşê de jî mezin dibin.

Zarokên welatê rojê, îro bi lehengî û bi dilawerî cihê xwe di nav tevî hêlên têkoşîna neteweyî de girtine û mîna moriyan xebatê xwe ya şoreşgerî didomînin. Di sermî danan de mîna Abidînan li hemberî hêzê dijmin ala xwe ya sor hildidin û îşareta serfiraziyê dikin. Ji bo ku xwe ji heval û birayên xwe re bikin feda, xwe diavêjin bi panzêran.

Dîsa li ber deriyê heps û zindanan, li berf û baranan bi hêrsa dilê xwe hêstirê çavan nema dibarînin.

Zarokê welatê rojê, mîna zarokên welatê cîhanê tu caran bi kêf û xweşî neçûn geşt û seyranan. Bi dilekî têr di mîrg û bîrzanan de tal (top) û birê nelîstine. Li Helepçeyê, li Cizîrê, li Gewerê û li Licê li ser serê wan wekî teyroka biharê bombeyên kîmyewî hatine barandin. Lê belê digel ew qas zilm, perçiqandin, qirkirin, mişextî û koşberbûnê, dîsa jî, hêviya xwe ya ji azadiyê qut nekirine, hêj bêhtir bi jiyane ve hatine girêdan û hezkirina ji mirovan di dilê wan de zêdetir bûye.

Belê, di dema îro de, ji bo welatekî azad û bê avakirin, pêwîst e kesaniya xurt, leşkerbûn û bi serleşkeran gelek pêwîstî heye. Zarokên welatê rojê, îro vê jiyana kolekî, bîrûmetî, bêdozgerî mehkûm dikin. Lewre ku dema zarokên welatê rojê lingên xwe diavêjin nava jiyaneke birûmet; li serê çav û zinarên azad, di hembêza dayika gendî zozanên. Serhedê yên hênik de, wekî teyî baz ku nêçîra xwe bigire, di newal û beştiyan de çeleng didin û qijîn dikin dibêjin "Hemû kesên ku dibêjin em mirov in, mirovperest in werin rewşa gelê me bibînin."



NIVSKARÊN kurd amadekariya çêkirina yekîtiya xwe dikin. Komîteya Avakar a Yekîtiya Nivskarên Kurdistanê (YNK), diyar dike ku têkoşîna neteweyî gihîştîye lûtkeyê, lewma avakirina rêxistinê nivskarên bûye pêwîstîyeke dîrokî.

Komîteya Avakar dixwaze ku hemû nivskarên kurd beşdarî kongreya avakirina YNK'ê bibin. Di nav komîteya avakar de ev kes hene: Yaşar Kaya, Sıraç Bilgin, Haydar Işık, M. Emîn Pencewînî, Medenî Ferho, Dilbixwîn Dara, Amed Tîgrîs, Kemal Mîrawdelî, Selîm Ferat.

Mêjû û cihê kongreyê wê paşê bê diyarkirin.



DI ROJA 35'a greva birçibûna girtiyên de, di 29'ê gulanê de, li Girtîgeha Amedê dewletê êrîş bir ser girtiyên PKK'yî. Li gorî agahiyan, 19 girtî birîndar in û tê gotin ku 6 girtiyên jî xwe şewitandin. Ji hêla din ve rayedarên girtîgehê jî, ji bo ku greva birçibûnê bişkênin û tîk bibin, bi sedan leşker û polîs şandine ser girtiyên.

Li aliyê din piştî bûyerê, nêzîkî 400 kesên jî malbatên girtiyên pêkhatî, li ber deriyê Girtîgeha Amedê êrîşa dewletê protesto kirin.

Her wiha komîsyonek jî aliyê Komeleyên Mafên Mirovan û Hiqûqvanên Hemdem ve hate avakirin, ji bo ku li girtîgehê lêkolînan bikin.

NÛÇE

Kurd dikarin Tirkiyeyê bikin komareke demokratîk

Li gorî raporeke ku li Parlamentoya Rûsyayê hate pejirandin, tê gotin ku şerê gerîlayên ARGK'ê rê li ber planên Tirkiyeyê yên pan-tirkîst û pan-îslamîst teng dike, lewma îro berjewendiyên tevgera kurd û Rûsyayê digihîjin hev. Di eynî raporê de tê eşkerekirin ku Ewrûpa û Amerîka dixwazin Rûsyayê parçe bikin, ji bo wê yekê jî Tirkiyeyê bi kar tîne.

Du heyetên Parlamentoya Kurdistanê ya li Derveyî Welat (PKDW), ku li Moskovayê beşdarî Kongreya Duyemîn a Kurdên Yekîtiya Dewletên Serbixwe bûbûn, li Kazakistan, Kirgizistan, Gurcistan, Ermenistan û Krasnadarê tîkilî û hevdîtînen xwe berde-wam dikin. Ev her du heyet, li gund û bajarên van welatan civînên gel jî li dar dixin û bi birêveberên van welatan re hevdîtînen fermî çêdikin.

Li gorî ragihandinan heyeta yeke-mîn, di bin serokatiya Serokê Yekîtiya Êzîdiyan û Endamê PKDW'ê Derwêş Heso de hevdîtînen civînên xwe li bajarên Gurcistan û Ermenistanê pêk anîn.

Heyeta duyemîn jî, di bin serokatiya Cîgirê Serokê Konseya Birêveber a PKDW'ê Remzî Kartal de, li Kazakistan, Kirgizistan û Krasnadarê xebata xwe ya dîplomasiyê meşand. Endamên PKDW'ê M. Emîn Pencewînî û Prof. Nadîr Nadîrov jî di wê heyetê de cih girtin.

Heyetên PKDW'ê di gel civînên gel, bi gelek rojnamevan, kanalên televîzyonê, wezîr û şexsiyetên girîng re jî hevdîtînan çêdikin û rewşa kurd û Kurdistanê tînin zimên. Heyeta duyemîn ya PDKW'ê li bajarên Kazakistanê; Cambol, Karatov, Çîmkent, Alma-Ata û gundên van bajarên civînên gel li dar xistin.

Cîgirê Konseya Birêveber a PKDW'ê Remzî Kartal, der heqê van hevdîtînen û civînan de ev agahî dan:

Piraniya kurdên ku koçberî Kazakistan û Kirgizistanê bûne, çand, folklor û kurdîtiya xwe parastine. Her du dewletan jî nasnameya kurdan nas kirine û polîtîkaya asimilasyonê çênebûye.


Li hin deveran zarokên kurdan di dibistanan de dersên bi zimanê kurdî dixwînin. Lê belê astengiya sereke kêmbûna dersdaran e. Sê çar sal berî niha li van deran xebatên ERNK'ê dest pê kirine û bi taybetî di van 2 salên dawîn de pevgerîdaneke giranbûha di navbera gel û şoreşa azadiya Kurdistanê de çêbûye.

Konferansa li ser kêşeya kurdan

Li Moskovayê, di 17'ê gulanê de bi organîzasyonê hin rêxistinên kurd û rûsan konferansek hate lidarxistin. Gelek şexsiyetên mîna Serokê Weqfa Navneteweyî ya Gelên Rûsyayê yên bi Manewî Nêzîkî Hev û Akademîsyen Trapeznîkov, Cîgirê Serokê Komîteya Parastina Aştiya Rûsyayê Isayev, Serokê Enstîtuya Lêkolînen Stratejîk Prof. Bîlîşenko, Nûnerê Weqfa Ermenan a Moskovayê Magdasyan, Cîgirê Serokê Komeleya Dostaniya Kurd û Rûsan Sûxarûkov û Bêrpirsê Rêxistina ERNK'ê li YDS'ê (Yekîtiya Dewletên Serbixwe) Mahîr Welat, bêsêdarî wê konferansê bûn.

Di konferansê de piştî gotûbêjan ev biryarên tawsiyeyî hatin girtin:

Divê li ser çand, ziman û şoreşa Kurdistanê lêkolînen fireh û sistematîk bêne çêkirin; divê agirbesta ku ji aliyê PKK'ê ve hatiye îlankirin bê destekkirin û xurtkirin; tîkiliyên çandî û neteweyî bînan danîn û ev tîkilî tîkevin pratîkê; divê şerê ku li hemberî gelê kurd tê meşandin bê şermazarkirin û ji bo ku komara tirk di vî şerî de qaydeyên şer yê Cenevre û Helsînkîyê bi kar bîne û daxwaza gelê kurd a aştiyê bîne ber çav



van, bang li rêxistinên navneteweyî yên wekî Neteweyên Yekbûyî û Parlamentoya Evrûpayê bê kirin; divê kurd jî wekî aliyekî beşdarî hevdîtînen ermenî û azerîyan ên ku li ser pîrsa Kurdistanê Sor bibin; divê di çareserkerina pîrsên gelê kurd de biryarên Konseya Parastîne ya Neteweyên Yekbûyî bêne bikar-anîn.

"Kurd tenê dikarin rê li ber Tirkiyeyê bigirin"

Li aliyê din roja 20'ê gulanê Komîsyona Jeopolîtîk raporek pêşkêşî parlamentoyê kir û ew rapor li parlamentoyê hate pejirandin. Di wê raporê de kurd wekî hevalbendên stratejîk tînen rêdan. Li gorî raporê gelê Kurdistanê bi tîkoşîna xwe ya neteweyî li ber daxwaza Tirkiyeyê ya ji bo dagirkeriyê dibe as-

teng. Tê gotin ku şerê gerîlayên ARGK'ê rê li ber planên Tirkiyeyê yên Pan-tirkîst û Pan-îslamîst teng dike, lewma îro berjewendiyên tevgera kurd û yên Rûsyayê digihîjin hev. Di raporê de tê îdiakirin ku Ewrûpa û Amerîka dixwaze Rûsyayê parçe bike, ji bo wê yekê jî Tirkiyeyê bi kar tîne.

Her wiha rapor dide zanîn ku Amerîka û Ewrûpa ji bi rola girîng a PKK'ê hesiyane, lewre jî li hemberî wê destekê didin hin rêxistinên kurd. Dîsa rapor dibêje ku ancax kurd dikarin Tirkiyeyê bikin welatekî demokratîk. Li hêla din Bêrpirsê ERNK'ê li YDS'ê Mahîr Welat roja 30'ê gulanê di hevpeyvîneke ji bo Özgür Politikayê de diyar kir ku ew pêşniyaza hevalbendîya stratejîk a Rûsyayê dipejirînin.

AZADIYA WELAT/MOSKOVA

Rewşa îroyîn a

dîroknivîsîna kurdî (3)

Dema mirov dibîne ku kurd girîngiya xwehêvotina li malê fêm kirine û dest avêtine çalakiyên li derveyî vê atmosfera ku morala mirov xera dike, cesaret tê mirov. Ew bi pêwistiya bidestxistina raboriya xwe û parastina çanda xwe hesiyaye, bêyî ku li dû selmandina biyanan bigere.

MEHRDAD R. IZADY


Gelo Lucianê ku yek ji wêjevanên bijarte yê wêjeya klasîk a grekî ye, kurd e? Ew li başûrê rojhilatê Semsûrê ango navçeya Semsetê hatiye cihanê û li wir mezin bûye. Lucian di nivîsên xwe de, bi pesdarî dide zanîna ku, ew gelek zaravayên grekî pir baş dizane. Wêjevanê mezin diyar dike ku, li Antakyayê wî wekî yekî yewnanî (Ionian) dizanin û li Atînyê jî mirov zen dîkin ku ew antakî ye. Her wiha ew bi rûgeşî dibêje ku kes ji xwerûnebûna zimanê wî neketiye şikê, lê ew bi eslê xwe kurdekî soran e û di xortaniya xwe de ew hî-nî grekî bûye. Li gorî gotina wî, wê demê di mala rê-veberê herêmi yê romanî de wekî suxrekar (berdest) xebitiye û di wê malê de yewnanî wekî zimanê (navqewmî) danûstandinê hatiye bikaranîn. (Harmon, Lucian, 1991. passim)

Hêvî heye ku kurd, di sala 1998'an de ji bo pîrozkirina 1800 saliya wî ji eleqaya ku di 1990'î de ji bo warê Lucian yê delal nîşan dan, zêdetir eleqeyê nîşan bidin. Tê zanîn ku warê delal ê Lucian ango Semsat ku gelek caran dengê stranên wî jê bilind bûye, di

1990'î de tevî mîrateyên xwe yên arkeolojîk di bin ava gola Bendava Atatürk de winda bû.


Lîsteya navên keleşorên çand û dîrokê ku kurd di vî pîroz bikin, mirov kare hê jî dirêj bike; dewlemendbûna vî keleşorê ne tişteki tesadûfî ye. Heke neteweyek xwediyê dîrokeke dirêj û navdar be, wê karibe her sal salvegerên wiha mûhteşem pêk bîne. Bîrastî jî kurd dikarin bi mafdarî her sal gelek bûyerên wiha pîroz bikin, ew jî pîvaneke diyar a dewlemendiya keleşora wan e.

Her kes û rêxistina ku dest diavêje karê rastkirina çewtiya qestî ya di kêmnîrxdayîn û biçûknimandina vî mîrateyê, pêwîst e rik û êrîşên hin mirovan bide ber çavan. Çi li qada akademîk, çi jî li qada siyasî di destpêkê de wê ew bi rîka hin kesan re rû bi rû bimîne. Divê mirov li benda vî reaksiyonê be, ji ber ku her xwedîderketina nû ya li parçeyek mîrateya mirovahiyê, divê doza kesên din derxe valahiyê. Mînak:



Niha ereb li Abû Hanîfa Dînawarî xwedî derdikevin, ji ber ku wî bi erebî nivîsandîye, her wiha faris jî doza xwediyê dikin ji ber ku Dînawar dikeve nav sînorên Îranê. Kurd dema doza zanyarê xwerû yê erdê xwe bikin, divê wî ji dest parêzgehên ereb û farisan derxin. Hêjahiyeye wisa kes bêtêkoşîn ji dest xwe bernade. Lewma jî her cure hewla pêşin a berhevkerin û sazkirina dîroka kurdî girêdayî bilindkirina têkoşînê û tîbirina hin rikberan e. Helwesta xwediyên hişyariya lêkolînî yan jî çakiya niyazan çî dibe, bila be.

Dibe ku hin kes bi mafdarî bipirsîn, ka çima dîroka neteweyî çima wisa dibe sedema şer û pevçûnan? Çima mirov ji bo parvekirin û bidestxistina mîrateyên dîrokî bi hev dikevin? Ka ji ber çî hêjahiyayan ji hev didizin?



Kirîna dîrokê rîya herî erzan e ji bo bidestxistina cihekî di qada navneteweyî de. Her wiha rîya herî erzan e ji bo ku yek doza xwe ya serdestiyê û doza li ser xakekê bide pejirandin. Êdî ew doz çiqas tewş dibin bila bin. Tu beşa din a zanistîya civakî û mirovî bi qasî dîrokê, bi politîka, dozên rawebûnê û îdiayên li ser erdekî ve neketiye nava hev. Bi tenê kurd hê nû bi girîngiya teqane ya dîrokê dihesin ji bo berzkirina doza welatê xwe. Xuya ye ku îro ne pir zû ji vî yekê. Ma hewce ye mirov bi bîr bixe ku Îsrailê çawa doza xwe ya li ser Zionê bi erdekî veqetandî yê di încilê de xurt kiriye? Ne girîng e ka di încilê de tişteki wisa heye an na. Rastî ev e, dîrok ji aliyê vî dewletê ve wekî tapûyê (şahid) hate nimandin. Teqez ev yek bû sedema handanê (teşwîq) ji bo hemû dewletan û komên ku doza dewletekê dimeşînin, da ku birek dîroknas xwedî bikin.

Nivîsandina dîrokeke neteweyî piştgiriya mezin û domdar a cemawerî û komên taybet divê. Ji bo kurdan, béguman serkeftina di vî warî de avaniyên akademîk ên kurdologên bisinc û canfeda (ku niha hejmaran wan gelekî hindik e) dixwaze. Ji ber ku ew navê dide guhartina statûkoya ku mîrateya neteweyî ya kurdî biçûk dixe, û wê dadixe radeya çandê keleşorî ya marjînal ku ji rewşa eşîrên hoveber ên çiyayî û gundiyan xizan zêde bi dîr neketiye, di xwe dide. Çawa ku Bios jî kalikên kurdan bi vî awayî dide nasîn. Ev 70 sal in ji bo şikênandina morala kurdan; çî ya mirovên ji rêze, çî jî ya rawêşbîran, ev karê ji rûmetê-xistinê tê meşandin. Pîrbûna çalakiyên bi vî rengî ne tesadûfî ne. Heta ew ne berê mentalîteya bazarê ya hin lêkolîneran e jî, ku çî dikarin bi dest bixin, bi dest dixin û dikin malê komên ku li ser lêkolînê dikin. Dema ev nêzikîtedayîna bi pêşdaraz a Ansiklopediya Îslamê (di pîrsa neteweyîya zanyarên ku ew didin nasîn de) li ber çavan bê girtin, tê dîtin ku tu qeza û tesadûf ne berpîrsê vî şeweya xerakirina dîrokê ya erebî e.



Ev yek li Rojavayê ku navê alînegirtinê di xwe dide, pêk tê. Dema li Ewrûpayê rewş wisa be, mirov kirinên hin saziyên dewletê yê li Rojhilata Navîn a ku ne xwediyê îdiaya alînegirtinê ye, mirov fêhm dike. Yanê mirov fêhm dike ka çima ew mîrateya kurdan in kar dikin û lê dixebitin ku kurdan ji xweberiya neteweyî û serbilindiya nasnava wan qut bikin.

Dema kurdek ji Rojhilata Navîn radibe û ji bo xwendinê diçe Rojava, rastî gotinên bi vî rengî tê: "Ji bo ku îsbat bibe, ka kurd netewe ye an komeke etnik e, delîl pêwist in." Îcar tu mirovên din, çi ji Rojhilata Navîn, çi jî kesên ji devereke din a cîhanê, mecbûr namînin ku nasnameya xwe ya neteweyî îsbat bikin.


Li pirtûkxaneyên hemû zanîngêh û dibistanan hin çavkanî û pirtûkên peritî, hene. Ew çavkanî ji bo hemû xwendekarên zanista siyasî û zarokên bimeqêrên eşîrên kurd in. Dema ew bixwazin li ser netewetiya kurdan xebatê bikin û tiştinan binivîsin ew karin bi tenê wan bi dest bixin. Heta hin caran mamoste xwendekaran teşwîq dikin ku peywirnameya xwe an jî teza xwe ya kutakirinê li ser serokeşîrekî kurd; şerê di navbera eşîran de (wekî pevçûnên negiring ên siyasî), an jî pîrsa di eşîrê de kî bi kê re zewiciye, amade bikin.

Aloziya bîrî, zivêrî, gemaroya rewşa giran a çandî û aborî dibe sedem ku gelek kurd bêyî ku haya wan jê çêbe, bibin haceta biçûkxistina neteweya xwe. W. R. Hay jî vê rastiyê destnîşan dike: "Kurd xwediyê xisletekî xurt in di warê xwe biçûkdîtinê de û ev meyl bi destê tirkên ku hemû bala xwe dane, osmanîkirin û jiholêrakirina hemû hestên wan ên qewmî, hatiye tundkirin. Însanekî kurd dema qala xwe dike, her tim peyvên wekî, zahîrbîn (kesê ku bi tenê rûyê tiştêkî dibîne) tamakar an jî wahşî bi kar tîne."

Dema mirov dibîne ku kurd girîngiya xwehêvotina li malê fêhm kirine û dest avêtine çalakiyên li derveyî vî atmosfera ku morala mirov xera dike, cesaret tê mirov. Ew bi pêwistiya bidestxistina raboriya xwe û parastina çanda xwe hesiyaye, bêyî ku li dû selman-

Gürdal Aksoy

TARİH İ YAZILMAYAN HALK KÜRTLER



avesta

Dema kurdek ji Rojhilata Navîn radibe û ji bo xwendinê diçe Rojava, rastî gotinên bi vî rengî tê: "Ji bo ku îsbat bibe, ka kurd netewe ye an komeke etnik e, delîl pêwist in." Îcar tu mirovên din, çi ji Rojhilata Navîn, çi jî kesên ji devereke din a cîhanê, mecbûr namînin ku nasnameya xwe ya neteweyî îsbat bikin.

dina biyanan bigere. Mesela, amadekarên Ansîklopediya Îslamê tu car xebatên bi wî rengî taswîb nakin. Ji ber ku ew çalakî wê gelek tiştên ku di ansîklopediyê de wekî rastî hatine pêşkêşkirin, pûç bikin û wan mecbûr bihêlin ku cildên stûr ên ansîklopediyê ji nû ve binivîsin.


Her wiha divê kurd, bi van çalakiyan nemînin, hewl bidin ku dîroka xwe ragihînin mirovan jî. Pêwist e hemû netewe bi pîrozbahiyên populer û serbilindiya beşdariya wan, nêzîkî raboriya xwe bibin. Lehengên neteweyî û serbilindiya bi dîrokê, dema mirov van ji cemawerê re taswîr bike û salox bide derdikeve holê. Mesela ne girîngbûna şexsan e, her wekî di meseleya Abû Hanîfa de diyar e. Heta, mesele ne saloxên baş ên di ansîklopediyên xwelligirtî de ne jî. Mesele ev e: Bi mîrateya neteweyî ya komekê ve ew çawa hatiye girêdan û çawa hatiye nasîn ji aliyê mirovên li kuçeyan ve. Lehengên neteweyî divê bi deb-debe bînin ragihandin. Bêyî daxuyandinên bi vî rengî, lehengên neteweyî rû nadin. Mînakê diyar jî vî yekê re Evliya Çelebiyê li Tirkiyeyê ye.

Şansê kurdan heye ku ji bo nivîsandina dîroka xwe ya neteweyî û pêkanîna serkeftinên di vî warî de pêdiviya wan bi tiştên çêkirî û îdiayê tewş tune ye. Her wiha hewcedariya wan bi kirîna dîrokekê jî tune ye. Li ber kurdan bi tenê karê vejîyandin û navdar-kirina dîrok û mîrateya ku wan gihandiye mirovahiyê heye. Piraniya bermahiyên arkeolojîk û belgeyên sereke yê dîrokî ji lêkolîneran bi tenê veqetandina demê dixwazin, spekulasyonê naxwazin. Lewre gelek çavkaniyên xas hene, tengasiya peydakirina wan tune ye. Êdî dema carekê dîrokanek tîrsa li hemberî statukoyê bişikene; xwe ji meyla paşçavkirinê (heta dijminatîyê) ya dîrokanên kevneşopî û reaksiyonên xweparastinî yê qewmên cîran rizgar bike, wê dîrok û mîrateya kurdan bi awayekî tekûz bînin nasîn û senifandin.

Wergera ji îngilîzî:
SAMÎ BERBANG

Hêza çaremîn, objektîvîzm û Don Kîşot (2)

MAZHAR GÜNBAT



Tu warê meslekî bi qasî çapemeniyê ne bişens e di sîdwegirtina ji pêşveçûnên teknolojîk û zanistî de. Bêguman her meslek bi awayekî û bi mîk-tarekê ji van pêşveçûnan îstîfade dike, lê, ne bi qasî çapemeniyê.

Teknîk, psikolojî, sosyolojî, dîrok, zîman, wêje, teknîka reklamê, wênekêşî, huner, grafîk, îstatîstîk û gelek warên din, heta zanista siyasî jî, îro ketine bin xizmeta vî warî. Li aliyê din, berê tu meslekî, bi qasî yê çapemeniyê ne fireh e.

Ew xîtabê hemû bîr û nîşên civakê dike.

Ev tişt tev derfet, avantaj û hêsaniyên vî karî ne.

Feqet dezavantaj, dijwarî û zehmetiyên wî jî, her wiha zêde ne. Ji bo karekî ku ji ew çend waran îstîfade dike, ji aliyê meslekî ve pisporî û pîrzanebûn dibe pêdiviyek.

Rojnamevanek eger bixwaze heqê vî karê berfireh û bitesîr bidê, pêwist e ji estetikê bigirin ta psikolojiyê, ji siyasî bigirin ta aboriyê, ji teknîkê bigirin ta dîrokê û hwd. bi gelek zanînan, xwe bix-

emilîne û bi taybetî jî, di şaxekî roj-namegeriyê de jî, bibe pispor. Wekî din, şev û roj û cih û war jî ji bo vî karî, ji hev nayên veqetandin. Lê belê, di gel vî yekê, metoda xebatê jî divê zanistî be.

Taybetiyeke din a rojnamegeriyê, objektîfî ye. Di çapemeniya nûjen a rojava de "objektîvîte heye an na", dikare bê munaqesekirin. Bi dîtina min tune, bes wekî ku hebe xwe daye pejirandin. Yanê ew ne objektîf be jî, bi teknîkên profesyonel, bi listikên medyatîk û siyasîteke pir hostane reng û îmajêke wisa ji xwe re di nav raya giştî ya cîhanê de çêkiriye. Bi vî yekê jî, tesîra xwe li ser raya giştî zêde kiriye û di destê komprador û sermayedaran de bûye çekeke bêhempa. Gelek caran, em dibînin ku, ev çapemenî, subjektîvîteya xwe an jî berjewendiyên çînekê wek objektîvîyê û wekî berjewendiyên giştî bi teknîkên rojnamegeriyê bi me dide bawerkirin.

Carinan ew, tiştêkî reş dikare wek spî bide xuyakirin, dibe di vî mînakê de hinek mubalaxe hebe, lê belê, tam ne wisa be jî, nêzîkê wê ye. Yanê dibe ku nikaribe reş bike spî, lê bêguman gelek caran spî dike pembe an jî pembe dike sor. Helbet di vî de, pisporiya meslekî roleke gelekî mezin dilîze.

Bi kurtî, eger rojnamegerî bibe xwedî hêzeke wisa mezin, hinek jî bi saya pêkanîna van xeml û taybetiyên meslekî ye.

Gelo bi awireke giştî ku bê nîrxandin,

medyaya me çawa xuya dike? Hin taybetiyên birûmet ên rojnamegeriya me hene ku bê guman ew nayên munaqesekirin. Ew jî fedekariyên madî û manewî ne, ji wî aliyê ve rojnamegeriya me nêzîkî bêqisûriyê ye. Bes li vir armanc ew e ku em hinek li ser kêmasiyên xwe yê meslekî bisekinin.


Gelo em çiqas ji wan warên alîkar ên rojnamegeriyê, îstîfade dikin? Ji bo me objektîvîzm çi ye? Em ji teknîkên medyatîk çiqas têdigihîjin? Kêmxwendina weşanên kurdan, tenê bi astengên ku dijmin ji me re çêdikin, bi analfabetîzasyona kurdan û egerên dîrokî dikare bê îzahkirin?

Ji bo pêkanîna derfetên û çêtirkirina medyaya xwe, em çiqas serê xwe diêşînin?

Em çawa nêzîkî objektîvîzma çapemeniyê dibin û jê çi fêhm dikin? Bêguman bi qasî medya û çapemeniya rojavayî subjektîf in, berevajiyê wan em objektîf in, ji ber ku em rastiyan dinivîsin û em mafdar in. Bes mixabin gelek caran, em nikarin dehê xwe bi ser nehê wan bixin, nikarin tiştên xwe yê rast û nîrxandinên xwe yê objektîf bi qasî subjektîvîzma wan, bi raya giştî ya cîhanê bidin bawerkirin. Esas ne tenê rojnamegerî, di gelek warên din de jî em rastî vî problemê tên. Gelo li vir, dîsa girîng-nedayîna teknîkên meslekî û rêxistinî, ne sebebek e di vî meseleya objektîvîzm û subjektîvîzmê de? Diyar e ku mirov mafdar be jî, eger girêdayî objektîvîzmeke klasîk û ziwa be, hingê dikare bikeve rewş û dewsa Donkîşot.

Îtirafên celadekî

Ev hevpeyvîna hanê di kovara heftane "El Kifah El Erebi" de, di hejmeta 924'an a bi mîjûya 15'ê Avrêla 1996'an de derketiye û ji aliyê Nebîl Elmilhim ve hatiye pêkanîn; ku hem rojnamevanekî navdar û di televîzyona Sûrî Kanal 2'yan de xwedî bernameyeke navdar e. Kesê ku hevpeyvîn pê re hatiye çêkirin jî, di navbera salên 1982 û 1988'an de xwedî wezîfe bûye. Nûnerê me yê Sûrî Jan Dost ji me re ji erebî ev hevpeyvîna balkêş wergerande kurdî.



Girtîgeha Amedê; ku tê de dîroka berxwedan û serhildanê dest pê kir. Ev girtîgeh ne li welatê me bi tenê, li cihanê tê naskirin; ji ber hovîti û tûdeya ku tê de li dilên azadiyê bûye û niha jî ev yek berdeham e.

Esad Oktay Yıldiran kî ye?

– Ew pirsyarê ewlehiya hundirîn a Girtîgeha Amedê ye, berê berpîrsê dilên Kibrîsê bû, piştî ku Tirkiyeyê ew girav xiste bin destê xwe, ew şandin Amedê. Ew yek ji efserên ku bi şeweyên azirandina (îşkence) xwe navdar e.

Niha ew li ku ye?

– Bi destê Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) hate kuştin.

Ma tu li ber wî ketî, tu bi kuştina wî xemgîn î?

– Na... Lê ez tirsîyam.

Ma tu hînî tirsê bûyî?

– Di destpêkê de min nizanibû tirs çi ye, bêhtirî kesekî li ser destên min mirin û min ên li ber mirinê, bi dehan dîtî.

Çawa hûn tediş (perwerdehî) dibûn?

– Bi dehan film ji me re dianîn, em di hêwanîna biçûk de datanîn û me li wan fişman temaşe dikir. Piştî re em tîjî daxwazî dibûn, daxwaziya kuştinê, êdî kuştina kê dibe hema bila be. Di destpêkê de şaşarên bêgule didane destên me, lê dema ku gule yek bi dest me diket, me dixwest em berdin, çi kes be hema bila be.

Piştî re me ders distandin li ser pêşiyên me yên ku împaratoriya wan gihîşt dawiya cihanê, divê me bigota: "Ereb gemar in, kurd mîrkuj û tawanbar in û divê em wan tîxin bin lingên xwe" û nedihîştin em tiştekî bibihîzin, ji bilî marşên leşkerî divê me sirûdên ku pesnê Tirkiyeyê didin ji ber bikirana û dersa esasî ya ku me stand ev bû: Karê te azirandin e (îşkencedan e) û karê yê girtî jî liberxwedan e.

Esad Oktay çi şeweyê azirandin dimeşandin?

– Ew bi xwe yek ji endamên kontr-gerîla bû, dilên Kibrîsê bi rengê

hovane azirandin. Û dema berpîrsiya Zîndana Amedê kete destê wî, metodên xwe bi pêş xistin. Pêşî simbelên girtiyên hildikirin, paşê porê wan kur dikir û piştî ku laşê yê girtî qenc diazirandin, wê wextê wekî berxê serjêkirî bi dar ve dikir, heta ji hiş diçû û dema hişê yê girtî dihatê serê wî, Esad segê xwe yê bi navê Co lê dihêvot, Esad pir caran digote me: "Co ji we bikêrtir e." Wî bîst girtî dixistin hucreyê 2 metre çarkeşe, û rojên dirêj ew tê de dihiştin. Pir zor e yek karibe bibêje çi dihatê serê wan.

Bûyerek bû, ez hejandim. Me li girtiyên zor dikir ku li ser dîwarên girtîgehê bi boyaxê, ala Tirkiyeyê çêkin, me bi boyaxê re tîner jî dianî. Wan her çar kesan xwe bi hev ve girêdan û tîner bi xwe de kirin û agir vêxistin. Girtîgeh di tariyeke reş de bû, ji nişka ve me dît ew bi laşê wan ronî bû.

Gelo kes di bin îşkenceyê de dimîrin?

– Min pir nedîtin. Yek hate kuştin navê wî Ali Arak bû û yek jî navê wî Abdurrehman Çeçan bû.

Piştî mirina wan tu çûyî mal, an tu li zîndanê mayî?

– Ez çûm mal, jina min li hêviya min bû, min jê re got: "Ezê stêrkeke din bi xwe ve bikim."

Tu bi gunehkariyê nehesiyayî?

– Hiç na, ez di wê gumanê de bûm ku ez bi karê xwe wekî ku tê xwestin radibim.

Çawa wekî ku tê xwestin?

– Divê efser fermanên serekên xwe pêk bîne, ferman ev in:

1) Eger mafê serek tune be jî, ew mafdar e

2) Her tişt li gori fermanên berpîrs dimeşe

3) Eger berpîrsê min bibêje: "Bimire divê ez bimirim."

Ma ji te re gotin: "Bimire"?

– Na... Gotin: divê tu bi kuştinê rabî, eger were xwestin.

Te çawa dikir?

– Divê em sibehê rabûna û me ferman bikira ku yên girtî sirûdên leşkerî bixwînin. Me zor li wan kiribû da ku wan sirûdan ji ber bikin. Carinan me

– Me li girtiyên zor dikir ku li ser dîwarên girtîgehê bi boyaxê, ala Tirkiyeyê çêkin, me bi boyaxê re tîner jî dianî. Wan her çar kesan xwe bi hev ve girêdan û tîner bi xwe de kirin û agir vêxistin. Girtîgeh di tariyeke reş de bû, ji nişka ve me dît ew bi laşê wan ronî bû.

Çi bi te hat, dema te dît ew dişewitî?

– Malîxolî bi min re çêbû, ez çûme mal û min xwe di rewşeke xerab de dît, ez ji mêranî ketibûm. Hesteryo bi min re çêbû, li Nexweşxaneyên Amed û Enqereyê, piştî re li yên Stenbolê ev tişt îşbat bû.

Jina te zanibû ku çi li girtîgehê çêbû?

– Erê. Lê berê wê tiştê li ser min nizanibû. Min jê re bûyerên girtîgehê digotin û min kirinên nebaş dixistin stûyê yên xeynî xwe. Carekê, efserê mezîni û celadekî bi navê Mînik Süleyman fişlên homo-seksuel kirin, efser gelek qelw bû, dema leşkeran ev çirok bihîştin, teva gotin wê M. Süleyman bibe celladekî jêhatî.

Gelo tu vê çirokê jî naxî stûyê yê xeynî xwe, her wekî te ji jina xwe re digot?

– Na. Bi min re neciriyaye. Ma leşkerê ku homo-seksuel be, di be celadekî jêhatî?

– Erê..

Çima?


– Qayideyek heye, dibêje ev babet (nîfs) ji mirovan, ji mêrên xurt hez nakin, îcar dema celad homo-seksuel be, kîna wî li ser girtiyên bêhtir e.

Yanê celadên we tev zêde bi kîna û sert bûn?

– Erê..... Hinekên din ji hene xwe şewitandin.

Wekî kê?

– Mazlum Doğan, di 21'ê adara sala




● **2.6.1991:** Ahmet Arif çû ser dilovaniya xwe. Ew di 1927'an de li Amedê hatiye dinyayê. Piştî perwerdehiya dibistana navîn, li Enqereyê dest bi Zanîngeha Fakulteya Dil-Tarih-Cografayê dike, ji ber fikrên xwe yên şoreşgerî pir caran tê girtin. Ji ber vê yekê ew dev ji zanîngehê ber dide. Ahmet Arif pirtûka xwe ya şîran a bi navê "Min bi hesreta te qeyd kevn kirin" di girtîgehê de dinivîsîne, di sala 1968'an de jî tê çapkirin. Piştî wê pirtûka helbestan, berhemên din nanivîsîne. Di rojnameya Cumhuriyetê de hevpeyvîna bi Ahmet Arif re di sala 1990'î de 8 rojan li ser hev tê çapkirin, ew hevpeyvîn pişt re wekî pirtûk bi navê "Ahmet Arif Anlatıyor" yanê Ahmet Arif vedibêje, tê çapkirin. Hin nameyên Ahmed Arif ku ji hevalê xwe Cemal Süreya re şandine jî, bi navê "Süreya'ya Mektuplar" hatiye weşandin.

● **6.6.1913:** Kovara Rojî Kurd dest bi weşanê kir. Ev kovar bi tirkî û kurdfî (kurmançî-soranî) hatiye weşandin. Xwedî û Berpirsê Giştî Evdîlkerîmê Sileymaniyî ye. Kovar mehê carekê hatiye çapkirin. Li gorî hin kesan, sê hejmar 'î gorî hin kesan jî çar hejmar derketiye, her hejmareke kovarê li çapxaneyekê hatiye çapkirin.

● **8.6.1992:** Nûçevanê rojnameya Yeni Ülke û Özgür Gündemê Hafız Akdemir li Amedê jî aliyê kontrayan ve hate kuştin. Ew, di sala 1984'an de bi hinceta ku endamê KUK-SE'yê bûye, hatiye girtin û li Girtîgeha Amedê, Eskişehir û Uşakê maye û di vê navê de dest bi niviskariyê kiriye. Di rojnameya Yeni Ülkeyê de nûçe, şîrove û lêkolînên wî hatine çapkirin. Di 8'ê pûşperê de, serê sibehê jî aliyê kontrayan ve li Amedê hate kuştin.

AWIR




Mazlum Doğan

1982'an de xwe şewitand. Di nav girtiyan de xayîn hebûn? -Hebûn, ji wan du kes hebûn; PKK'ê ew kuştin. Piştî ku ji girtîgehê derketin. Sahin Dolman (Dönmez) û Yıldırım Hezekit (Merkit). We dihişt xizm û mirovên girtiyan werin wan bibînin. -Serdana wan deqeyekê dirêj dikir, girtî bi zikxişkê dihate ba xizmên xwe, yek caran xizm riswa dibûn. Na... Çek caran tawan der heqê wan de çêdibûn. Kalekî 70 salî hate kuştin, ew bavê girtiyeke bû navê wî (navê girtî) Medeni Gorga bû. Kê havê Medeni Gorga kuşt. Gelo Esad Oktay bû.

- Na.. Serhengêkî (efserekî mezin) ew kuşt. *Girtîgeha Amedê bi çiyê xwe, ne wekî girtîgehên din e.* -Ferq tune, tenê hinek girtîgeh wekî Tîpa 'E'yê ne û hin wekî Tîpa 'L'yê ne. A Amedê wekî E'yê ye, ya berê wekî L'yê ye. *Tu hîn nemêr î?* - Erê.. *Tu poşman î li ser kirinên xwe?* - Na, poşmanî nîn e, carinan ez dixwazim verişim, carinan nefesa min tê girtin, carinan ez xemgîn dibim, hêrs têne min... *Ma hîn tu sirûda "Yê tirk ne wekî tu kesî ye" dibêjî?* - Carinan ez wisa dikim. Lê her carê ez gêj dibim û dilê min tê ber devê min, ez dixwazim verişim. *Ev bi jina te re jî çêdibe..* - Jina min jî nema, ew bi rîyeke din de çû. *Tu bi hacetî wê dibî?* - Bi wê qasê ku ez naxwazim wê bibînim. *Tu dikarî agahiyên li ser awayên îşkenceyên girtîgehên Tirkiyeyê bibêjî?* - Ez nema zanim, lê hin wêne hene, girtiyeke ew resim kiribûn. Tu dikarî kopiyekê jê bibî. *Ev serêşiyê jî te re çênake?* - Di demeke nêzik de ezê herim Frankfurtê, min vîze standiye.. Ez nema li Tirkiyeyê vedigerim. *Lê eger PKK da pey te û tu girtî?* - Tişteki ez li ser bitirsim li ba min nemaye.

ÇAVDÊRÎ

AMED TÎGRÎS




Tirkiye dirize

Li Tirkiyeyê êdî dewlet bi hemû dem û dezgehên xwe ve riziya ye û pûç bûye. Wekî dara ku bi hezaran kurm bikevin navê û pûç bikin. Dewleta tirk jî bi dem û dezgehên xwe ve wiha pûç bûye. Êdî ew li ber ketinê ye. Parlemantoya wan biryara dadgeha bilind napejirîne an jî di wextê de bi cih nayîne. Çîller û Mesut hikûmetê xera dikin, gotinine xerab namînin ku ji hevdu re bibêjin, lê wezîrên her du aliyan jî beşdarî civînên koneya wezîran dibin. Tansu Çiller bi milyaran pereyên dewletê xerc dike û dibêje: "Ez ne mecbûr im ku ji tu kesî re bibêjim, min ev pere daye kê an jî li çi xerc kiriye... Ev sireke dewletê ye, ez vê sirê jî Mesut re jî nabêjim..." Yên ku nizanibin dê bibêjin qey her du jî ne serokwezîrên Tirkiyeyê ne, her yek ji wan serokwezîrê dewleteke din e. Wekî Tansu Çiller serokwezîra Tirkiyeyê be û Mesut Yılmaz jî serokwezîrê Sûriyeyê an jî yê Îranê be, tişteki wiha ye. Nizanin ku her du jî, eynî jehr in! Jixwe, ji dema damezirandina Komara Tirkiyeyê ve, dewlet bi hemû dem û dezgehên xwe ve, ne dewleteke demokratîk bû. Lê qet nebe, formalîte be an jî ji bo xapandin û çavgirêdana xelkê be jî, wê demê dîsa dewletê bi dem û dezgehên xwe hin caran demokratbûna xwe nîşan didan. Dem û dezgehan li hemberî biryarinê hevdu rêz digirtin. Niha dewlet ji binî ve riziya ye. Ji derî du dem û dezgehan yê din naxebitin, rizîne û pûç bûne. Ew her du dem û dezgehan an jî sazîyên ku li ser xwe mane eskerî û polîs in. Di van salên dawiyê de kurmik ketine laşên wan jî, lê diyar e ku hîn baş pûç nekirine. Jixwe dewlet li Tirkiyeyê jî van her du dezgehan pêk tê. Yê din formalîte ne. Dixwestin bi wan çavên raya giştî ya Tirkiyeyê û ya cîhanê girê bidin û bixapînin. Li Tirkiyeyê tu kes û sazî nikare li esker û polîsan rexne bigire. Dîsa tu hêz û kes nikare hatin û çûyînen van her du dezgehan kontrol bike. Bi butçeyên wan ên salane bizanibe ka çend trilyon e. Ev trilyon yek bi yek ji bo çi tîr xercîrin. Ev ne hedê tu kes û hêzî ye ku bikaribe bipirse. Jixwe dewlet a wan e û ew jî xwediyê dewletê ne. Bi awayê vekirî û dizî nivî butçeya salane ji van her du hêzan re ye. Di van salên dawiyê de, bizava rizgarî ya neteweyî her ku xurt bû û bi pêş ket ev tişt hîn zelaltir diyar bû. Êdî dewlet bi hemû dem û dezgehên xwe ketiye rewşeke wiha ku li ser têkçûnê ne. Kemalîstekî wekî Şevket Kazan ku Serokê Baroya bajarê Stenbolê ye, di televîzyonê de, bi awayekî vekirî dibêje ku "Êdî li Tirkiyeyê edalet nemaye." Şevket Kazan wiha dom dike: "Di şûna ku welatîyên me herin ba avûqat an jî serî li mehkemeyê bidin de, ew diçin ba serokên mafyayê. Giliyên xwe bi mafyayê re dikin. Mafya bi telefonê kar û îşê wan hel dike. Lê, eger ew herin mehkemeyê, mehkeme bi salan dom dike. Di dawiyê de jî, hakim nikarin bi serê xwe biryarê bidin, ji ber ku biryar a siyasî ye. Jixwe heta çend salan mehkeme di cih de jî biryar bide, ew mirov nagihîje mafê xwe. Ji ber ku li Tirkiyeyê enfasyon di salê de ji % 150 ye. Ji ber van sedeman jî, welatî êdî li avûqatekî baş nagere, li mafyayeke baş an jî li siyasethanekî baş digere ku îşê xwe pê biqedîne. Bi kurta hî sistema edaletê li Tirkiyeyê nemaye, ji binî ve pûç bûye, riziya ye." Li welatê ku edalet, azadî û wekhevî tune be, zordarî û zordestî ye. Kedxwarî, zêrandin û çewsandin heye. Girtîgeh û kuştin heye. Hêviya dawiya sermayedarên Tirkiyeyê desthilatdariya Anayolê bû. Ka çi bi serê wê de hat? Tirkiye her roj gav bi gav ber bi têkçûnê ve dimeşe. Rewşa wê xerab e. Ji ber ku sistem xerabe bûye û ji binî ve riziya ye. Dûr an nêzik, ew dê hilweşe. Êdî jîndarî û vejîna wê ne gengaz e.



Gereke astengkirî û qedexekirî



İsmail Göldaş

Nivîskarê me İSMAIL GÖLDAŞ li ser navê HADEP'ê bi Heyeta "Ji bo Aştiyê Werin Ba Hev" da ku lêgerîn û lêkolînan li ser bûyeran bikin, ji Stenbolê çûn welêt. Dê gera wan bi dorê li van bajaran Amed, Sêrt, Xabûr, Zaxo, Etrûş û Duhok pêk bihata. Lê ger nîvco ma; ji Xabûrê pê ve destûr nedan ku derbasî Başûrê Kurdistanê bibin. Göldaş çavdêriyên xwe yên li ser vê gera nîvco ji me re bi tirkî nivîsand û Zana Farqînî jî ew wergerande kurmancî.

Em di 20'ê gulana 1996'an de, saet di 9.30'an de, li Petrol-Îş'a Amedê ne. Me civîna xwe ya pêşîn pêk anî; Serokê Navçeya Navendê yê HADEP'ê ji me re behsa greva birçibûnê dike, ku li navçeya HA-DEP'ê ya Baxlarê didome. Çûn û hatina avahiya navçeyê hatiye qedexekirin, elektrîka wê hatiye birîn, ava wê hatiye qutkirin, şandina doktor û alîkariya îlaç û dermanan hatiye astengkirin.

Nêzîkî 20 malbat, bi taybetî jî lêzim û xizmên girtiyan ku ji jinan pêk tên û di grevê de ne, di nav tarî û birçîtiyê de ne... Sê kesên di grevê de nexweş in. Xwestina ji bo anîna doktor, vegeriye "bila bînin ser doktor." Malbatan ev teklîf red kiriye. Daxwaza Serokê Bajêr a hevdîtina bi walî re nehatiye pejirandin. Serê heftiyekê ye ku negihane "Walîyê Herêma Awarte".

Deynê navçeyê yên av û elektrîkê jî tune bûye. Heyet biryarê dide ku bi walî re hevdîtinekê pêk bîne. Em tevî kameraman û kesên ku wênêkêşên xwe avêtine milên xwe û xistine stûyên xwe li mînîbusê siwar dibin. Çavên me, di kolan, bîna, dukan û çavên mirovan ên meraqdar de, beliqandî dimîne. Yüksel (ku ji Almanyayê hatiye tevî heyetê bûye) kameraya xwe ya gilover û mezîna li Amedê digerîne. Û Qonaxa Walîtiyê.

Em li hundir in. Walî li ser maseya xwe ye, li kêleka wî jî alîkarê wî. "Fermo, hûn bi xêr hatin," dibêje. Şanar (Yurdatapan) qet ji windakirina wext hez nake. Dest pê dike, wê rewşa li navçeyê bi wê uslûba xwe û hevokên

baldar ji Walî re îzeh dike. Walî, mercên ne-asayî (fewkalade) yên li vir, bi helwesta "dewletî", bi awayekî kurt vedibêje. Dadixuyîna ku heta niha derbarê rewşê de, tu kesî bi şeweyeke resmî serî li wan nedaye.

Ez dest bi gotinê dikim. "Birêz Walî, em di dîroka siyaseta me de cara pêşîn lê rast tên ku, rêveberê partiyê nikare here avahiya xwe," dibêjim. "Çi munasebet" dibêje. Ez jê re "Tiştêkî wisa nabe ku divê rêveberên partiyê bi destûreke resmî herin avahiyê û jê derkevin," dibêjim. Dîsa, peyva ku em dê di hemû dema geştê (gerê) de bibihîzin derdikeve ber me: "Ev der, dewleteke hiqûqî ye. Em di nav mercên ne-asayî de derbas dibin. Bi hinceta ewletiyê..." Jixwe hewce bi tiştên din namîne li vê herêmê. Hûn herine ku derê "bi hinceta ewletiyê" dertê pêşiya we û ne mimkun e ku hûn vê yekê biguherînin û di ser de biqewizin.

Ez jê re dibêjim ku em dê seredana avahiya xwe ya navçeyê bikin. Dibêje: "Fermo, tu asteng nîn e." Em bi lez ji Qonaxa Walîtiyê derdikevin. Saet 11.10...

Em ji erebeyan peya dibin. Li koşeyan panzerên spî. Derdor bi polisên fermî û "sivîl" dagirtiye. Bêtel bi gotinekê diçine ber guhan û dadikevin. Bi "temam hate fêmkirin", "li ser seran amirê min" "baş e amirê min," bêtel li destan digerin. Em di deriyê pasajê de dikevîne hundir. Li ber merdîwanê me didine sekinandin. Di destê wan de çek û her der girtine. Ê sivîl û zefî "Hûn nikarin herin" dibêje me. Dîsa "bi hince-

ta ewletiyê." Şanar dibêje ku me bi walî re hevdîtin pêk aniye û derbarê rewşê de wî agahdar bikin. Çend hebên din jî tên. Gotinên wekî "Li vir çi dibe, ev kî ne?" Di nav wan de tên pirsîn. Encam: Hinceta ewletiyê, rewşeke ku walî eleqedar dike, nîn e.

Polîs jî, hêzên ewletiyê ne ku rîayetî fermanan dikin. Lê derbarê çûn û hatina avahiya partiyê de tu evdekî Xwedê nivîsek, belgeyek nişî me nade. Li vê herêmê "gotin" bes e; ku ew gotin ji leşkeran wekî ferman derketibe, temam e. Her wezîfedar pêwîst e ku rîayetî wê fermana sert bike. "Mekan" û "merciya" wezîfedarên sivîl vê yekê qet naguherînin.

Şanar Yurdatapan bi wan gotinên xwe yên bi îtîna û musaft "Temam em dê niha lê bixebitin ku em hilkişîne hafê. Hûnê jî, ji me re bibin asteng (manî). Em dê jî, vê rewşê tespît bikin, pişt re jî em dê herin cem walî tespîtên xwe jê re vebêjin," dibêje. "Em çi bikin, di destên me de çekên me jî nîn in, rewşeke me ya ku em bi zorê jî hilkişîn hafê jî nîn e." dibêje. Peywirdar (wezîfedar) ji bo ku here ba amirê xwe, ji cem me diçe. Bi bêtelê diaxivin, li çep û rastê diçin û tên. Di vê navê de anonsên "Ji kerema xwe re vir terk bikin" peywirdarê sivîl û biçek tê. Ji bo derketina jorê destûr nadin, sedem dîsa "bi hinceta ewletiyê". Xwedêgiravî nizanin li hundir çi dibe û diqewime. Dîsa em vedigerin ba walî, di ber çavên meraqdar re.

Vê carê Walî nîn e. Alîkarê Walî heye. Bi deqîqeyan ji bo ku rewş û mercên ne-asayî û "hinceta ewletiyê" bibê-

je, dipeyivê. Di dawiyê de dibêje ku di van mercan de tiştêkî ku ew jî bike nîn e. Alîkarê Walî bi êşkere dibêje ku ew li derveyî vê rewşê ne. Qaşo gels bi qa-nûnan ve eleqedar e.


Em dizivirin. Ber deriyê avahiya me ya navçeyê vala ye. Di hundirê pasajê de peywirdarên sivîl li ser sêpayên biçûk rûniştine. Sakin in, radibin. Şanar "çi bû" dibêje. "We berê jî ev bikira ma nedibû" dibêje wan. "Em çi bikin, pêwîst e ku em rîayetî fermanan bikin," dibêjin.

Em dikevîne hundir, tofana çepikan dest pê dike. Tê lîlandin. Binîşanên serkeftinê ve tên bi leq me de. Bi devêkî dibêjin ku 11 roj in bînan, av û elektrîk in. Pîrekên sergirêdayî me hembêz dikin. Dest pê dikin bi awayekî biryardar derdên xwe ji me re dibêjin. "Em aştiyê dixwazin, ew koletiyê ji me dixwazin" dibêjin û bi vî awayî dawî li daxuyaniyên xwe tîne; her kesê/a ku radihêje mîkrofonê.

Ne heyecan, ne tirs û ne jî fikareyên wan hene. Panzerên li derve, peywirdarên çekdar, îstîxbaratvanên sivîl û kamera ji wan re qet ne xem in. Gava dibêjin "Em aştiyê dixwazin" çavên min tije dibin. Dora axaftinê ya min e. Ez tije dibim, dikim mit bibim. Ez dixwazim destên çavan bi sedan car ramûsim. Ez dest pê dikim, vedibêjim. Çepik, lîlîn û qîrîna "bijî" dikevîne kerika guhên min... Em ji wir vediqetin.

Saet 17.30, em amadehiya çûna Sêrtê dikin. Firtûneyeke mezîna dest pê dike, pişt re jî baran dibare. Ez li Yüksel difetîlim. "Ev jî bereketa me ye" dibêjimê. "Wele" dibêje "Ez nizanim, berekete an jî felaket e, ne êşkere ye." Şanar her car lêpirsînê dike, em jî "em li vir in" dibêjin. Carinan jî "dê were" dibêjinê. Şanar diqilqile. Hewa ji nişka ve tê girtin. Em ewrên reş û gewr li dû xwe dihêlin. Ji Amedê em derdikevin û em ber bi Sêrtê ve rê dikudînin.

Hevalê Amedî, li aliyê rastê cihêkî nişî me dide. "Ev der cihê ku Apê Mûsa lê hate kuştin e," dibêje. Taviê, Apê Mûsa di mêjiyê min de zindî dibe. Ro-



Emê doza xwe bib

Heyeta "Ji Bo Aştiyê Werin Ba Hev" Roja 25'ê gulanê li Salona O... anî. Endamên heyetê êşkere... tengezar kirine û bi çavên dijminatîyê...

Kesên ku di civînê de axivîn, diyar agahiyên nasnameyên endamên heyetê agahdar kirine, lê dîsa jî ev tişt...

Endamên heyetê helwesta rayedarê dan zanîn. Ji ber ku mafê wan ê azadî... apporta wan hebûye jî nehiştine ku ew... hate gotin ku ewê vê yekê bibin Dadg...

Di nav heyetê de Hunermend Şanar (Yeni Yüzyıl), Murat Badgî (Ji NÇM), İsmail Göldaş (HADEP) Jill Geaw...

ja wî ya dawîn a li Enstîtuya Kurdî û gava ku eniya min maç kiribû, tèn bîra min. Xemgînî û hizneke erjeng xwe berî hundirê min didin.

Em li Sêrtê ne, Saet 8.30 şevê ye. Em li Sêrtê hatin rawestandî û li ser me lêgerîn pêk anîn, em kontrol kirin. Tavilê polîsên sîvîl tèn otela ku em lê dimînin. Şanar bi yekî sîvîl re diaxive ku ew li walîtiyê peywirdar e. Ew kesê sîvîl di dema geşt û gera Basayê (Güçlûkonakê) de jî hebûye. Ew jî "Em bi ewletiya we re eleqedar dibin" dibêje. Koray Düzgören "Ma hûn me ji çal û kortên rîyan diparêzin?" dibêje. Em dikenin. Yê sîvîl jî dibişire. Ewlekarê sîvîl "Kesên ji ÖDP'ê di nav we de hene?" dipirse. Ez tavilê xwe diavêjim pêş. "Hûn bi wan re eleqedar dibin gelo?" dibêjimê. "Na" dibêje, "Meraq dikim." "Min jî got ka hûn bi wan re eleqedar dibin" dibêjim. Vê carê serê xwe pêl dike.

Em diçin ser nivînên xwe. Ez bi serê xwe tenê, di odeya bi nimroya 513'yan de bi cih dibim. Her teraf ker bûye. Li derve tu bendeyekî/ê Xwedê nîn e. Tenê "tedbîrên ewletiyê" hene, ku bi hatina me ev rewş qewimiye.

Saet 8.45'ê serê sibehê ye, em di riya ku diçe walîtiya Sêrtê de ne; kamera li ser milan in, li derdorê jî awirên meraqdar ên mirovan. Walî, kamera, wenekêş û teyban hîlnade hundir. Em hemû, yeko yeko têne kontrolkirin, li ser me digerin. Em nasnameyên xwe datînin û hildikişin hafê.

Walî, li rex jî Mudurê Emniyetê bi leq me de tèn. Wekî ku kêfxweş e, xwe dide xuyakirin. Şanar bêyî ku wext wînda bike dibêje ku, em ji bo lêgerînan li ser kuştina du mirovên sîvîl, Ali Çetinkaya û Tahir Özer hatine vir. Li Mudurê Emniyetê dizivire "Mijareke ku rasterast we eleqe dike" dibêje. Walî dadixuyîne ku Tirkiye, dewleteke hiqûqî ye û her kes dikare di vê çarçoveyê de mafên xwe bi kar bîne. Dibêje ku ew her du kes li çolê hatine kuştin û Dozgeriya Komarê (Cumhuriyet Savcılığı) dest daniye ser bûyerê.

Koray "Gelo tu girêdaneke rêxistinî ya van her du mirovan hebû?" Ji Walî dipirse. Mudurê Emniyetê bersivê dide û "Na, me tişteki wisa bi dest nexist" dibêje.

Li taxa Çakmakê, li ber çavên her kesî Ali Çetinkaya û Tahir Özer dibin.


Dadgeha Ewrûpayê

Ku ji bo çavdêriyê çûbû Kurdistanê, biban ji bo çapemeniyê civînek pêk di rê de hêzên dewletê ew gelekî hatiye nihêrtin.

Ku beriya mehekê ji bo vê gerê, wan walîyê OHAL'ê û rayedar li ser şîne.

Emê wekî bînpêkirina mafên mirovan hatê hatiye bînpêkirin, tevî ku pas-paşûrê Kurdistanê bibin. Her wiha şîfên Mirovan a Ewrûpayê.

Atapan, Rojnamevan Koray Düzgören (holê), Hüseyin Karabey (kameraman) nevana îngiliz) cih girtibûn.



Pişt re cendekên wan ên gulekirî, ku li ber tavê werimîne û reş bûne, têne dîtin. Bêyî ku ji malbatên wan destûrê bistînin û wecîbeyên dinî bînin cih, wan defin dikin; bi tenê îfadeya pîrikekê distînin.

Yek jê 65 û yê din jî 28 salî, du mirovên sîvîl û xizan. Em çûn serdana malbatên her du kuştîyan; ku li eynî taxê ne. Her du jî, ji dewletê hesab dipirsin. Pîreka Ali, li ser kevîr rûnişt û dest pê kir revandina şûyê (merê) xwe vegote me. Di hembêza wê de zoraka wê û çiçik jî di dev de. Xizan û bêkes maye. Dengê jinika pîr a din, bi slogana "Bijî Serok Apo" li holê belav dibe.

Dema ku em dê derkevin, fermande ji Koray dipirse: "Hûn ji ku ne?" "Ez Stenbolî me" dibêje. Fermande dibêje ku ew ji Trabzonê ye. Û dest pê dike: "Binêre, ew, waniyan, amediyan, mêrdîniyan nakujin, lê min û te dikujin."

Zar û zêç, jin û mîr têne cem me.

Li dûrî me jî erebeyên polîsan. Kamerayên wan di camên taksiyan de xuya dikin. Qederek berê ev her du pîrek li dadgehê (adliyeyê) bûne. Ew birine ku îfadeyên wan bistînin. Min ji wan "Ma hûn qet natirsin?" pîrsibû. "Em dê çima bitirsin, kesê ku her roj miriyan bibîne dîtirsin gelo?" gotibûn min.

Wan her du pîrekên ku mîrên wan hatibûn kuştin dest dane hev, li Sêrtê li daîreyên dewletê digerin û "Em qatilên mîrên xwe dixwazin" dibêjin.

Saet 17.50, em li ser terka rê ya Kerboranê têne rawestandî. Panzeran rê birîne. Hawir û zevî ji leşkeran tijî bûne. Nasnameyên me kontrol dikin. Li valîzên me jî dînihêrin. Ev rewş di temamiya rêwîtiya me de, du-sê kilometreyê carekê derdikete pêşiya me.

Dibêjin me ku ew dê me bibine Midyadê. Di ber me re erebeya polîsan bi lezgîni dibihure, hêrsa me radibe. Li pişt me û hin ji wan wêdetir erebeyên leşkeran hene. Bi vî awayî em li Emniyeta Midyadê dan peyakirin. Rayedare-

kî sîvîl çayê ji me re dixwaze. Dibêje me ku em dê çaya xwe vexwin û herin. Rayedarê leşkerî tê. "Em zehf ji we hez dikin. Canên we emanetî me ne. Hûn nikarin di riya Hezexê de herin" dibêje.

Yê sîvîl serê xwe pêl dike. Ez jê dipirsim. Dibêje min ku, ewletiya rê ne aîdî wan e. Gotina rayedarê leşkerî çî be, ew e.

Dema ku em dê derkevin fermande (başçavuş) ji Koray dipirse: "Hûn ji ku ne?" "Ez Stenbolî me" dibêje. Fermande dibêje ku ew ji Trabzonê ye. Û dest pê dike: "Binêre, ew waniyan, amediyan, mêrdîniyan nakujin, lê min û te dikujin." Hevalê parêzer (ebûqat) "Fer-

mandeyê min, hûn cudatiyê dikin" dibêje. Ew, "Ev çî ye" dibêje.

Riya me saetek tê dirêjkirin. Di her dema lêgerînê de, hinekî din jî, di dema me diçe. Her diçe, em pê dihesin ku deqîqe bi deqîqe hewayaya di navbera me de ne xweş dibe. Li her cihê kontrolê hîn bêhtir made û mirûzên me tîrştir; şêl û bizavên me sertir dibin. Tarî bi ser me de tê. Ronahiyên sînor wekî xêzekê, li ber me dirêj dibin. Ew alî Sûriye ye. Ronahiyên Qamişloyê li ser aliyê rastê pehn bûne.

Ez bi Faruk re sohbetê dikim. Ji min re behsa Qamişloyê dike, car caran jî ez li Cemileyê difetilim û "Em te li vê bihêlin" dibêjimê. Ew jî "Xwezî" dibêje. Em dikenin. Em dê di Nêzirxanê re derbas bibin.

Saet di 9.15'ê serê sibehê de, em ji Cizîrê dibihurin ku hîna jî şopên guleyan li ser avahiyan hene. Li pêşberî me Çiyayê Cûdî. Li milê çepê, namlûyên topan hatine hildan û berê wan dane Cûdî. Kamyonên neqliyatê dane dû hev, bûne qor bi qor. Pir germ e.

Û Xabûr. Peywirdarên sîvîl û leşkerî di nav tevgerê mezî de ne. Şanar radihêje pasaportên me dibe. Em saetkê dipên. Tê. Ew nahêlin. Em şoke dibin. Şaşwaziya ji rûyê me, tê xwendin. Li rast û çepê elemanên JITEM'ê digerin, polîsên fermî şofêran ji me bi dûr dixin. Hewaya di navbera me de her diçe xerabtir dibe. Tê xwestin ku em ji qadê herin. Daxwaznameya me nayê standin. Tavilê telefon têne birîn. Polîsên li derdorên me zêde dibin.

Li pêş û paşiya me erebeyên polîsan, ji neçarî em Xabûrê terk dikin. Di rê de me tenbih dikin. Dibêjine me ku, em ancax dikarin biçin Silopiyê; dê kes ji erebeyê peya nebe û nekeve nava gel û tu telefon jî divê neyêne kirin.

Em li ber dûwarê adliyeyê têne rêzîkirin. Li bin me kursiyên qehwexaneyan hene. Esnaf û kesên ku tèn û diçin bi çavên meraqdar li me dimêzin, li pêşberî me û li ber qehwexaneyê tîmên taybet. Serê simbelên wan bi jêr ve şiqitandîne (simbelên faşîstên MHP'yî), rû û milên wan ji tavê qemirîne. Kamera me dikişîne, carinan jî bi veşarî. Em bi destan îşaret dikin. "Niha binêre, di pişt erebeyê de ye", gava li me werdiqilin, xwe vedîşerin.

Em daxwaznameya xwe ya der barê "daxuyaniya sûc" de didin merciyên rayedar. Em li hev diçin û tèn. Ji tîman hin kes belaya xwe di me didin, dîberîsin me. Yüksel dixwaze telefon bike. Tîmê ku serê simbelên wî bi jêr de şiqitandî ye, jê re dibe asteng. Dibêje "Qet nebe em li ber siyê rûnin". "Na, ji cihên xwe ranebin", dibêje.

Saetek derbas dibe, ez diçim ku Şanar wan bînim. Şêl û tevgerên tîmê ber bi heqaretkirinê ve diçin. Hewa pir germ e. Em li ber dûwar, li ser kursiyên rûniştî dipên. Em Şanar wan hil-tînin.

Li pêş û paşiya me erebeyên fermî, di cemseyan de leşker, em dikevin riya ber bi Amedê. Geştê me nivco dimîne.

Em li balafirê têne siwarkirin. "Vê qasê bi xatirê te Amed." Lê ev hevok jî dilê me dikewgirîne.

Di zimanên biyan de

Hinek ji nivîskar û hunermendan, her çende ne bi zimanê xwe yê zikmakî, bi zimanê bêgane berhemên xwe nivîsîne jî, lê kî û çî çax bixwîne wê yekser zanibe ku xwediyê vê nivîsê kurd e.

awazên kurdî



Ahmed Arif

Helbet, li ku dibe bila bibe, di bin çî nîr û kawdanan de di-be bila bibe, axaftin û nivîsîna bi zimanê zikmakî xweştir û birûmetir e. Lê, heger hat û bi salan, ji ber eger û rûdanên nasurîstî mirov dûrî ziman û rewîstên xwe yên neteweyî bikeve, angî mirov bi zimanê xwe nexebite, nepeyive, mirov bi salan dûrî şunwarê xwe li fêrgeh û li bajarên bêgane bixwîne, bimîne, tiştekî zor surîstî ye ku êdî mirov dê nikaribe bi rîya nivîsîn û berhemên hunerî xweşî û nexweşiyên di dil û mêjî de bi zimanê zikmakî -li dûv daxwazê- bide xuyakirin. Nemaze ku ev nivîskar kurd be û di ser re jî li Rojhilata Navîn be. Bêlome ye.

Ev serpehatiya xemgîn û dijwar, rastiya jiyana nivîskar û hunermendên kurd in û ne bi zimanê xwe yê zikmakî, bi zamanên biyanî (erebî, farisî, tirkî) berhemên xwe nivîsîne, gelek in. Hinek ji van nivîskar û hunermendan bi temamî ji dara jiyana xwe ya kurdewarî dûr ketine û li koka xwe xwedî nekirine. Ango, bi hebûna xwe ve û bi sanahî mîna kelemperan xwe bi ber bayê siyaseta asimilasyonê xistine. Êdî ji kurdan re hebûn û nebûna wan ne hinde girîng e.

Hinek ji van nivîskar û hunermendan jî, digel ku li koka xwe bi xwedî derketine û bi serbilindî kurdbûyina xwe di her keys û delîvê de anîne ziman û parastine jî, lê mixabin ku ji rewîst û gerdişa jiyana kurdewarî dûr ketine û nekarine dimenên di serê xwe de

bi şeweyeke kurdewarî li ser kaxizan darêjin. Hinek ji van nivîskar û hunermendan jî, her çende ne bi zimanê xwe yê zikmakî, bi zimanê bêgane berhemên xwe nivîsîne jî, lê kî û çî çax bixwîne wê yekser zanibe ku xwediyê vê nivîsîna kurd e. Ji ber ku yê nivîskar kula dilê xwe û dimenên di serê xwe de li dûv perwerdekirineke neteweyî darijtiye ser kaxizan. Ji daxuyakirina dimenên di serê xwe de, nasnameya xwe ya neteweyî û erdnîgariya xwe jî li pêş çavan radixîne. Di tevahiya berhemên xwe de, bi peyva xwe, bi danûstandina xwe ya rojane, nasnameya xwe ya neteweyî bi serbilindî dide xuyakirin.

Ji ber ku perwerdeyên yek binecilê ne naveroka berhemê van nivîskaran gelekî nêzikî hev in. Bo nimûne; Mewlewî Pelxî (Silêmanî), Selîm Berekat (Amûdê), Ahmed Arif (Amed). Ev nivîskar û helbestvanên kurd, her çende bi zimanê farisî, erebî û tirkî berhemên xwe nivîsîne jî, lê, ji jiyana kurdewarî dûr neketine. Helbest û nivîsînên xwe bi kilîşeyên kurdewarî ava kirine û bi motîfên kurdî xemilandine.

Bêguman, berhemên nivîskar û helbestvanên kurd ên bi vî rengî xizmeteke mezin ji zimanên serdest re kiriye lê, ji ber egerên nasurîstî ku di serê nivîsa xwe de me dabû xuyakirin, mirov nikare van nivîskarên bi vî rengî ji kurdewariyê bişû û veder bike. Ji ber ku wan, dimenên di serê xwe de, êş û azarên neteweya xwe bi cihanê bidin nas-kirin, mirov dikare bibêje wergerandine zimanên neteweya serdest.

Nêzikiya naveroka du helbestên hel-

Way qurban

Paş çiya û çiyayên te nazdar e.

Di rex zinar de şivarêkek diçe badok-badok.

Nexweşeke te heye, bêhêvî.

Dibe ku Elîf be, dibe ku Rewşê be Bejin simbilek e veder e.

Çîçikên wê, li bin çîçikên wê janek, kêreke xiniz...

Ev mirin e, mirina hejaran ez hatim, ezê bêm nabêje.

Yan berî nîvrojekê yan ber êvarî yan jî bi xewmaşa elendê re hew ku te dît rû da ya ku wê rû bide.

Nexweşeke te hebû bêhêvî kesera wê di xewan de kesera wê sare-avan de.

Êdî, du çîçekên tirsê ne çavên wê du keskayî

gîrstirîn çîçekên tirsê vedibin di kûrahiya çalan de...

Paş çiya û çiyayên te, zor dijwar e.

Kesekî ku raman be û bir bibê ma heye gelo ?

Roj ji kîsê kê dike êvar

Ji mehrevaniya hewran kî xêrê dibîne dundeyê baş mekîne, çawa dibe ejdeha.

Ya ku qutê gur û gêrikan dide

xak, çawa dibe bi aheng

û himbêz nake gêsîne reş

rû nade gayê leng.

Zembîlfiroşê min karkirekî rijdê ye,

ne birno, bêrê digre Nazifê Ruhayî

havlê wî derketiye mezatê

bazar-bazar e can.

Sor, sipî û gewrik

genimê hişk û nermik

yên xudan destên hunermend in ev.

Ji bo qutê gewriya kore

Ji şîyan ketiye derbeder digere...

Paş çiya û çiyayên te

ez çawa bidim xuyakirin...

Bêdar, bêsi, bêbalinde rût û tazî.

Way qurban...

"Kî di ber vî welatê bihişt de

xwe nake gorî."

Mêrxasî, ger tu bi dojiştan bî jî

xwegorîkirin divêt.

Da em karibin te bikin bihişt,

Ji bo gelê jar û binamûs.

Her ev e ew çirok,

her ev e ew viyana dijar.

Hezkirina ji te felsefe ye

bêkêmasî.

Bawerî ye, diwartirîn aram e.

Digel hebûna fişek û sêdaran

diçe, nazdar û bêperwa

rêz bi rêz çiyên dirûxîne

avên rewan bi paş de vedigerîne

mafê sêwiyan distîne

pêşkêş dike li dûv verêja xwe...

Roj ku bê, dewran vegere hêvî bigihê.

Li paş çiya û çiyayên te

ne wisa keser û hejarî,

simbilek jî bi tena xwe sil namîne

dareke zeytûnê jî bi tenê namîne...

Ger ku bixwaze de bila nebare baran

ger ku bixwaze de bila hişyar nebe

çiya.

Ma ev dil bo çî rojê lêdide...

Ji rehên wê direve taristan.

Direve careke din nazivreve.

pêşkêş dike,

ji yê ku razandiye di himbêza xwe ve

him jî, bi şadûmanî pêşkêş dike

li pêş ronahiya mêjiyê me jêrzemîn.

Hemî kejan hêj xort

hêj bixêr û bêrtir e.

Pêşkêş dike xêrava zelal zelal

ciwantirîn çandiniya evîna temenê xwe

ji hunerê destên me rûzemîn.

Bergeşa dagirtî, dayika kenok

zarokên biken.

Yek bi dehan

yek bi sedî avis e êvarî

bi elendê re dertê hêzkarî.

Derewa min tune

gotina min, gotina mêra ye

her

di wê verêjê de nivîsandî wisa ye

her ew viyan e ji ber ku wisa ye...

Ahmed Arif

Wergera ji tirkî: Dildar Şeko

bestvanên kurd ku yekî bi farisî û yekî jî bi tirkî nivîsiye, vê rastiyê xweş dide xuyakirin. Bo nimûne malikek ji helbesta Mewlewî Pelxî ya bi navê 'Naley Cudayî' ku bi farisî darijtiye:

Bêşno ez ney çûn hikayet mîkuned/ Vez cudayî ha şikayet mîkuned/ Ez neyistan ta mera hubridi end/ Der nefirem merd û zend nalîdi end.

Wateya malikê: *Guh bide neyê bê ka çî dibêje/ Ji cudahiye bi gilî û gazin e*

Dema ji neyistanê zengiloka min birîn Jin û mêr ji wê demê ve her dinalin

Vêca em guhê xwe bidin pişkek ji helbesta Ahmet Arif a bi navê 'Ûy Herwar' ku bi zimanê tirkî darijtiye.

Û tu, hêj gavka dî/ Sal jî derbas bûbin hêj gavka dî/ Wek dara birekbûyî ya ku jê cuda bûme/ Egera temenê min, hunermenda min, evîna min/ Birîna te kûr çûye, xamûj nagire dizanim...

DILDAR ŞEKO



Vê heftiyê li navêndên çandî û hunerî çalakîyên alternatîf ên li dijî HABITAT'a fermî pêk tên. Li navêndên demokratîk û yê kurdan vê heftiyê ev çalakî wê pêk werin.

2.6.1996 Yekşem: Geşta NÇM'ê ya Kevneşopî ya Duyemîn.

3.6.1996 Duşem: Konsera Mizgîna Sor, saet: 18.00, Şanoya koma BEKSAV'ê listika 'Nûçeyan ji ku bidin', saet: 19.00, Konsera Koma Munzur, saet: 20.30

4.6.1996 Sêşem: Mizansen-Berxwedan (Emek Kültür Merkezi), saet: 18.00, Slayt-Koçberî (Stran Kültür Merkezi), saet: 19.30, Konsera Yenigün Müzik Topluluğu li BEKSAV'ê, saet: 19.30

5.6.1996 Çarşem: Şanoya Lîstikvanê Can Şenlîgi li NÇM'ê, saet: 17.00, Slayt li ser Helebçeyê Li MED-KOM'ê, saet: 18.15, Konsera Kutup Yıldızı li NÇM'ê, saet: 18.45, Şanoya Babil Halk Sahnesi (Yüz Çiçek Açsın Kültür Merkezi), saet: 19.30

6.6.1996 Pêncşem: Slayt-Koçberî li Tûm Sağlık-Senê, saet: 18.30, Şanoya Jiyana Nû li NÇM'ê listika 'Mirin carinan dibe jiyân', saet: 19.00, Konsera Zarokên Ar, (Arya Kültür Merkezi), saet: 18.45

7.6.1996 În: Beşa NÇM'ê Hunerên Dîbariyê, saet: 18.00

8.6.1996 Şemî: Şanoya Hêvî, listika 'Qêrîna Bêdeng' li NÇM'ya İzmirê, saet: 14.00, Konsera Koma Amed li NÇM'ê, saet: 18.00

RÛDAN

Yek ji dengên Hêviyê:

Kovara Rojî Kurd

Her çiqas me gotibû ku weşanên kurdan xwedî jiyaneke kurt in, lê dîsa jî ew xebatên ku hatine kirin, ji bo çapemeniya kurdan bûne bingehê girîng.

Îro baş tê zanîn ku çapemenî çendî girîng û lazim e ji bo civakê, da ku bi riya wê her kes dengê xwe bigihîne her kesî.

Çapemenî di dema xwe ya destpêkê de wekî îro ne xwedî roleke mezin bû, lê îro bi sedema pêşveçûn û firehbûna teknolojiyê jî ew gihîştîye radeyeke mezin.

Her çiqas di tarîfkirina çapemeniyê de tê gotin ku, karê çapemeniyê ragihandin e, di pey wê re jî perwerdekirin e, lê em ji bo çapemeniya kurdî ancax dikarin bi-bêjin ku tam berevajî wê ye.

Yanê ji roja ku kurdan

dest bi weşandina kovar û rojnameyan kirine heta îro, perwerdekirin her tim di rêza pêşîn de cih girtiye. Mixabin kurd ji ber gelek sedeman, mîna gelek warî di vî karî de jî zêde pêşve neçûne û serfiraz nebûne. Heta em dikarin bi-bêjin ku ji xeynî Kovara Hawarê tu weşanê demeke dirêj weşana xwe nedoman-diye.

Kovara Rojî Kurd jî bi mijara me re eleqedar tenê mînakek e.

Belê, Rojî Kurd li Stenbolê di sala 1913'an de, bi awayekî mehane dest bi weşanê kiriye, lê bi tenê 4 hejmar (li gorî hin nivîskaran 3 hejmar) derketiye.

Hej.1- 6 Pûşper 1913

Hej.2- 6 Tîrmeh 1913

Hej.3- 1 Gelawêj 1913

Hej.4- 30 Gelawêj 1913

Ev kovar mîna Weşana Cemiyeta Telebeyên Kurdan-Hêvî derketiye. Ev cemiyet jî li Stenbolê di 1912'an de hatiye damezrandin. Piştî ku weşan Rojî Kurd tê sekinandin, ev cemiyet Kovara Hetawî Kurd dide weşandin. Mixabin ev kovar jî, piştî demeke kurt weşana xwe dide sekinandin, ji ber Şerê Cihanê yê Yekemîn.

Di Kovara Rojî Kurd de bi tirkî û kurdî (kurmançî û soranî) nivîs hatine weşandin.

Xwedî îmtiyaz û mudirê mesûl ê vê kovarê Evdîlkerîmê Sileymaniyeyî ye. Tevî van berpirsiyan Evdîlkerîmê Sileymaniyeyî, bi taybetî li ser zimanê kurdî û perwerdekirinê nivîsên xwe tê de dane weşandin. Tevî Sileymaniyeyî, bi navên rastîn an jî mustear, nivîsên; Dr. Abdullah Cewdet, Necmeddînê Kerkûkî, Mesûdê Sileymaniyeyî, Necdetê Diyarbekirî, Fuad Temo, Fexrî, H.B. yê Xarpêtî, Fazil Muxlisê 'Eşîra Millî' û hwd., derketine.

Bi taybetî nivîsarên Dr. Abdullah Cewdet, ên li ser zimanê kurdî gelekî balê dikişîne.

Hê wê demê pêşniyaz kiriye ku, alfabe ya erebî bersivê nade zimanê kurdî û ji ber wê jî, divê 8 tîpên din li vê alfabe yê zêde bibin. Tevî Dr. Abdullah, Mesûdê Sileymaniyeyî û Salih Bedirxan (bi înzeya M.S. Azîzî) jî, li ser zimanê kurdî gelekî sekinîne.

Tê dîtin ku di hin hejmarên Rojî Kurd de bi alfabe ya ku Dr. Abdullah pêşniyaz kiriye (bi alfabe ya ku ji 40 tîpan ava bûye), hin nivîs di Rojî Kurd de hatine weşandin.


Ji aliyê Cemal Xeznedar ve Rojî Kurd, li Bexdadê di 1981'an de careke din wekî xwe hatiye çapkirin. Li gorî wê çapê, ebadê kovarê: 24.2x17 cm. ye.

Her çiqas me gotibû ku weşanên kurdan xwedî jiyaneke kurt in, lê dîsa jî ew xebatên ku hatine kirin, ji bo çapemeniya kurdan bûne bingehê girîng. Bûne, mîna alên ku di pêşbaziyê (berebaziyê) de ji destekî derbasî destekî din dibin. Belê ew al vêga di destan de ye û divê mirov wî alî bigihîne heta dawiyê û bi ser bikeve.

AYNUR BOZKURT

TÎŞK

LERZAN JANDÎL



Zonê dayikê

Zonê dayike ser ro gumra çî amê/enê vatene. Kirmancan miyan de na derheq de xêlê kemasî, çewt zanayenî estê. Bêguman, doman ke huna zerê maya xo de ro, vengana heşneno. Doman, nê vengana ra vengo ke zafêrî heşneno, şinasneno. Hama na nêna a mana, ke doman zerê maya xo de jî zonê dayika xo fam keno. Yan jî demê destcikerdena zonê dayike musayene zerê maye de dest keno ci. Nê, nayê qe kes nêvano. Çiyo ke doman heşneno, teyna vengo yan jî rîtm o, zon niyo. Doman ebi şinasayena vengê maya xo, baweriya xo re dayê ano. Ebi na baweriya jî, hevzê tersanê xo, nezalaliyanê xo vecîno. La belê naca mesela na wa, ke zonê dayike çik o û mordem se şikîno nê avê bero, na der heq de problemî çik ê? Ma wazenîme nê nivîsî de zaf kilm nayê ser ro vinderîme, ke bîr û bawariyê çewtê ke na der heq de estê, wa werte ra wedariyê.

Seba zone dayike tenê faktorî lazim ê.

faktor	zon
koke.....	zono ke verde amê musayene
şikîyena zonî...	zono ke en rind/ rindêrî eno hukum kerdene
mentalîta ruhî...	zono ke, qesekerdox kesîtiya xo tede vîneneno, ebi dê xo kesêneno

fonksiyon..... zonoke en zaf/zafêrî êno xebetnayene
Zonê dayike teyna şikîno, ke hukim bikero, eke nê faktorî pêro bêrê ca. Ma faktorê zonê dayike sosyalîzasyon de çik o?

1) Zonê dayike, viraşten û stabîlîze kerdene kesîtiya şexşî yê domanî de, rolê de girs cêna. O xizmetê avêşiyena bingexsîyê/bazsîyê domanî keno

2. Ebi zonê dayike, namekerden û qesekerdena çiyana, yê ke der û dor dê ênê diyene, musînê.

3. Ebi zonê dayike doman famkerden, musayen (kavramak), reynadayen û fonksiyonê dê de vindena, museno. Ebi dê doman şikîno tecrûban bicêro û bidêro.

4. Zonê dayike zanayena cematî avê heno (taşiyor) Ebi dê doman xez-nazanayena cematê verênî museno.

5. Ebi zonê dayike doman "organîze" hereket û qesekerdena cematî cêno û ebi dê qesekerdena xo debeno kompetent.

Faktorên 2 dîne ra hetanî 5 hine binê "sembolîzekerdena" de ênê famkerdene. Ebi zonê dayike doman karê "sembolîzekerdena" ya xo avê beno.

6. Zonê dayike, hacêtê komunîkasyonê zerrê çêyî û grup o. Ehi dê dîrok viraştene, cadegureten, vurnayena eleqanê sosyalanêke çê û grupê de estê, benê. Edet û tora musayen û musnayene. Ebi kilmîyê viraştên û newekerdena kesîtiya kulturî

7. Zonê dayike domanî welat ra girê dano.

Eke nê şertî pêro piya bêrê têlwe mordem şikîno vaco: "No zonê dayik o."

Probleme domanane kirmancanê teberê welatî de nê wê, ke nê şertî seba zafêriya dînan niyamê ca. Naca ganî ma û piyî, pedegogî ebi kilmîyê kirmancî domanê xo rê nê şertan biyarê ca. No jî ebi karê de zanayene, ebi sebir û xebatê de xurt beno. Se/çito? Ma nivîsê mayê bîniî de nayê ser ro vinderîme. Hetanî reyna...

Tunebûn


Rojek... rojekê ku berfa dawîn a ji çileyê reş maye heliyaye, sirûstê çî şênahîya wê hebe, derxistîye holê. Kulîlkên zer bi xweşikîyên xwe bi birayê xwe re bi tavê re dikenin, kulîlkên sor, şîn û pembe bi hemû quretîya xwe bi lezgînî. Ji bo ku ji xweşikîyê tiştêk kêr nebe pelên xwe vedikin, pelên daran, betilîna salekê ji ser xwe avêtîne û wekî keçikeyê biçûk a çavşîn li derdora xwe dinêrin. Çemekî biçûk... wekî ezmanê pak û vekirî, hêdî hêdî diherike, tu dibêjî qey naxwaze masiyên ku hambêz dike, biêşîne.

Kêzik û peritankan îro ji xwe re kirine cejn û bi bêderd û kul ji xwe re dilîzin. Karik û hemû heywanên hê nû hatine ser rûyê dinyayê, bimeraq li derdora xwe dinêrin, pozê xwe dixin her derê, da ku her tiştî hîn bibin. Birayê wan tav jî biken, ramûsanên dişîne ji wan re...

Û ez di nav van tiştan de, li ser pelekî gulekê niqutek av bûma, a ku xwe ji tîrêja tavê xelas kiriye û wînda nebûye, ezê li derdora xwe li hevalên xwe bigeriyama ji ber ku...

Odeyek, odeyêkê nivîsê, li hêlekê teks û nivîsên şanoyê; hinek qetandî hinek ne qetandî, li ser wan libîsê şanoya tev çirandî û bela-wela, li hêla din pênûsên şikestî û murekeba wan ji cihê şikestî bi dilxemgînî diherike. Pirtûkên gava din, ew jî wekî hevalên xwe yên çekên çandê, ji hêla wan ve hatiye parçekirin, pirtûkek ji hevalên xwe yên din dût ketiye, niqutek xwîn li ser e. Xwedê zane xwîna nivîskarê wê ye, ji ber ku wexta pirtûk dihat qetandin, nivîskar û hunermendên din jî, ji êrişê para xwe distandin.

Tembûreke şikestî li qozîyê ye, dilê wê bi kul tîje bûye û dixwaze bigirî. Lê hêstirên xwe vedîşêre. Li qozîyê din ûdek xuya ye, ew tîlên ku gava ku dihat zimên, dilên wekî pola jî diheland, a nika her yek li aliyekî belav bûne, lê dîsa jî ji girtiyên xwe tiştêk wînda nekiriye û li berdê ye... Wêneyek... wêneyekî ku bi destan hatiye çêkirin, tablo ji du hêlan pêk tê. Hêlek tenê bi rengê reş û spî ye, çek e, tank e, xwîn e, term in, bi kurtasî şer e; hêla din rengîn e. Rengên cîhanê yên herî xweşik tev hatine ba hev, kombûna xwe pîroz dikin. Lihevhatina xwe, ji hev re qal dikin, çavên bi ken jî li wan temaşe dikin. Û tablo ji du hêlan pêk tê, hêlêke reş û spî û neçirandî, hêla din bi rengîn û delal, lê çirandî. Bi dehan kaset li rastê hatine belavkirin. Di nav



Ezê li derdora xwe li hevalên xwe bigeriyama. Ez li ser vî wêneyî ku van hemû tiştên di nav xwe de kirine yek, bersiva pirsê "Em çima di vî halî de ne?" bûma, wê guhê min li benda dengê bersiva kesên wekî min bûya.

şerîdên her kasetê de gotin û muzîka evîna mezin tomarkirî, bi kedeke qandî Çiyayê Agirî mezin hatine çêkirin, bi diltenikiyê giran janên mirovan ên dîrokî tînin roja îro, yên îro jî digîhînin wan rojan.

Û ez li ser vî wêneyê ku van hemû tiştên di nav xwe de kirine yek, bersiva pirsê "Em çima di vî halî de ne?" bûma, wê guhê min li benda dengê bersiva kesên wekî min bûya, ji ber ku...

Şeveke tarî.. Welatekî bindest.. Çiyayekî bilind, tenê ba azad bi rîya xwe de diçe.. ji ber ku, ew li cihêkî bilind e û destê kesekî nagihîje.. Kulîlk û mirov stûxwar, bilbil û mirov dilbixem.. Dil û emrê mirovan hezar sal e. Mirovên nûçebûyî heta bigihîje ber mirinê temenê dilê wan hezar sal e. Bêhna şewatê li newalan belav bûye, navê mirinê, bûye tiştêkî nas, dengê teyareyan û dengê paletên tankan bêhtir bilind bûne. Cendekek li ser vî çiyayê bilind e, pîrek an zilam e; qet ne girîng e, dirêjkirî ye; di rûyê wî de ken, di çenteyê wî de evîn, di berîka wî de hêvî û çeka wî ji milê wî neketiye jêr.

Dilê wî wekî mirovên din ne pîr e. Emrê wî 20 an 30 be jî, dilê wî 12 salî ye, miribe jî, dilê wî hê zindî ye. Wekî yê hevalên xwe yên ku hê nemirine. Lîngekî xwe ber bi xwe ve kişandîye, li ser piştê ye, destê çepê seranser dirêj kiriye. Destê rastê jî axa di bin destê xwe de hişk girtiye, wekî ku naxwaze jê biqete.


Miriye... Çi ji hêla tîmên taybet, çî jî, ji hêla cerdevanan ve qet ne girîng e. Birîna wî ji dilê wî ye, ji singê wî ye çepê, xwîn hêdî hêdî diherike. Xwîn berê di fanêra binî re derbas dibe û ji qapûtê wî bi lezgînî xwe digihîne axê, wekî ber bi xwestiyê xwe ve baz bide, xwe diavêje hambêza axê. Li ser axê jî diherike, ji hinek kevîran û giyayan derbas dibe û dihere ber kulîlkeke stûxwar disekine.

Di bin koka wê de dibe gol, kulîlk wê mêvana xwe venagerîne, deriyên xwe jê re vedike û serê xwe hêdî hêdî bilind dike. Her diçe ev kulîlk di wê şeva tarî de wekî fanosêkî vedikeve, ronahiya wê li ser vî çiyê dibe wekî çiruskekê û silavan ji stêrikan re dişîne. Û ez ronahiya vî kulîlkê bûma, minê çavên xwe bi lezgînî li çiyayên derdora xwe, li hevalên xwe bigeranda, ji ber ku...

Minê zanibûya ku tenêbûna min, tunebûna min e.

XÊLYA

Nûbihar



Demokrasi;
lêbelê demokrasiyeke çawa?

Hejmara Nûbiharê ya 40.

Kovara Nûbihar, hejmara xwe ya 40'î jî derxist. Wekî ku tê zanîn ev kovar, kovareke mehane ye û mijarên çandî, hunerî û edebî tê de cih digirin.

Manşeta Nûbihara vê mehê "Demokrasi; lê belê demokrasiyeke çawa?" ye. Ev nivîs ji aliyê Berpirsê Giştî yê Weşana Nûbiharê Sabah Kara ve hatiye nivîsîn.

Tevî vê nivîsê çend nivîs ji vê hejmarê: Prof. Dr. Muhammed Saleh Gaburî "Şûra û Demokrasi", Süleyman Çevik "Li ser pirsgerêkên demokrasiyê", Ali Karadeniz "Demokrasi çi ye?", Mela Silêman Şoreş "Ey felek bêbextê", Abbas Alkan "Bi dû tengahiyê firehî ye".

Ji xeynî nivîsan, ev demeke dirêj e ku, ji aliyê Selman Cihadvan ve "Pirsname" tê hazirkirin. Di vê "Pirsname"yê de 10 heb pirs tên kirin. Ji nav kesên ku bersivan şandine, ji 10 kesan re, kitêbek ji Weşanxaneya Nûbiharê tê diyarîkirin.

'Metod' a bêmetod!

Xwendevanên bi zimanê kurdî baş dizanin ku weşanên bi kurdî gelekî kêr in û têrê nakin. Divê em ji tunebûn û valahiya di vî warî de îstîfade nekin û berhemên hêja û bifeyde li dû xwe bihêlin. Çunkî însan bi kirinên xwe, wê rojekê werin yadkirin.

Pirtûkeke hêja û gelekî binirx ketê nav warê edebiyata kurdî. Ev pirtûk hem ji aliyê zimên, hem jî ji aliyê naveroka xwe ve gelekî xurt e û mirov dema dest bi xwendinê dike, nikare ji destê xwe deyne.

Belê, dil dixwest ku mirov bi vî rengî dest bi vê nivîsê û danasina vê pirtûkê bikira, lê sed mixabin ev tişt ne mimkun e.

Xwendevanên bi zimanê kurdî baş dizanin ku weşanên bi kurdî gelekî kêr in û têrê nakin. Lê ew nayê wê maneyê ku mirov ji vê valahî û tunehiyê îstîfade bike, xwe û xwendevanan bixapîne.

Pirtûka (!) ku ez jê behs dikim, ji aliyê Maruf Yılmaz ve bi navê "Metod" hatiye hazirkirin û ji bîst rûpelan ava bûye. Weşanxaneya Jîndanê li Swêdê di 1996'an de ev pirtûk çap kiriye.


Pêşî em ji navê vê pirtûkê dest pê bikin. Bi rastî jî navê pirtûkê çima "Metod" e û metoda çi ye, min bi xwe tişteki jê fêhm nekir. Ev yek.

Ev pirtûk ji bo kê û çi hatiye hazirkirin? Yanê ji bo zarokan an ji bo kesên din! Ev jî dudo. Ji ber ku di vê pirtûkê

de tu agahî li ser tişteki nîn e, em jî nikarin tu agahiyê der heqê van yekan de bidin û bistînin.

Binêrin! Eger ev pirtûk ji bo zarokan be (zarokên ku bi kurdî nizanin), wê zarok çi jê hîn bibin, an jî wê çi bikin bi vê pirtûkê ne belî ye. Mînakê: Di rûpelekê de di bin sernavê "Navên Rengan" de, rêz bi rêz wiha hatiye nivîsîn: QEHWEYÎ: BRUN, SOR: RÖD, ŞÎN: BLÅ, REŞ: SVART, PEMBÛ: ROSA, ZER: GUL, KESK: GRÖN. Li hemberî van navên rengan ji pîrpirokên bêreng yanê reş û spî, hatine xêzkirin. Ez vê dipirsim: Gelo zarok wê li rengên pîrpirokan! (reş û spî) binêrin û li gorî navê ku li hemberî wan e, reng û navên wan hîn bibin an, divê li gorî navên rengan ku hatine nivîsîn, ji derdora xwe bipirsîn û hîn bibin, dû re jî pîrpirokan boyax bikin?

Mîna keke din: Pisîkek li ser piyan rawestiyaye û li derdora pisîkê jî xwedêgiravî navê organên wê hatine nivî-




sîn. Navê organan li cihên wisa hatine nivîsîn ku mirov dikare her tişt jê fêhm bike, yanê têrî xwe tevîhev bike. (Tablo 1.) Mînak dikarin zêdetir werin da-yîn, lê li gorî min gerek nake.

Ha, eger ev pirtûk ne ji bo zarokan be, wê demê jî ez hîç naxwazim bifikirin ku ji bo mezinan e jî.

Armanca min ne ew e ku ez tinazên xwe bi vê pirtûkê bikim. Lê bi rastî jî dema min ev pirtûk(!) dît, ez şoke bûm û dilê min gelekî êşiya. Ji ber ku hem pêdiviya zimanê kurdî û hem jî yên xwendevanên bi kurdî, bi xebatên cur bi cur heye. Hele bi taybetî jî, ji bo hînkirina zimanê kurdî xebatên xurt û cidî lazim in.

Wekî me berê jî got, divê em ji tunebûn û valahiya di vî warî de îstîfade nekin û berhemên hêja û bifeyde li dû xwe bihêlin. Çunkî însan bi kirinên xwe wê rojekê werin yadkirin.

NUR-HAYAT



Tablo 1.

Sûîkasta Abdullah Öcalan

AHMET BARAÇKILIÇ



Di van rojên borî de serokê PKK'ê talûkeyeke mezin derbas kir. Ji bo vê bûyerê jî gelê kurd re, ji gelê Rojhilata Navîn re û ji mirovatiya pêşverû re derbasî be.

Tunekirin û windakirina birêz Öcalan ji me re û ji hemû pêşverûyan re windahiyeke mezin e. Ji ber ku Öcalan ji bo rûmeta mirovên pêşverû têkoşîneke bêhempa didomîne. Ger ev têkoşîn neyê domandin gelê Kurdistanê rizgar û azad nebe, dibe kêmasiyên hemû kesên birûmet. Ev kar û bar jî barê me hemûyan e. Öcalan di rêza yekemîn de û barê herî giran hilgirtiye.

Ji ber van jî Öcalan rûmeta gelê xwe ye. Birastî em tu caran nûçeyêke wilo naxwazin bibihîzin. Ji bo nebihîstina wê jî pêwîst e partî û bi taybetî gelê Kurdistanê wî biparêze û têkoşîna rizgariyê hîn zêdetir û hêztir berdewam bike.

Di dîroka PKK'ê û di dîroka gelê kurd de gelek komplot û hovîtiyên wilo çêbûne. Pêwîst e û gelek girîng e ku, em ji dîroka xwe ders û tecrûbeyan hilbigirin serok û rêberên xwe biparêzin, ger em neparêzin ew dibe kêmasiya hemû kesî. Gelên ku rêberên xwe neparêzin nikarin mafên xwe jî biparêzin. Em li dîroka gelê kurd dinêrin û di dîrokê de dibînin ku, gelek rêberê raperînan bi komplot û bi dek û dubariyên mêtîngeran hatine qetilkirin. Ji rêber û navdarên kurdan gelek kêr bi xwe çûne ser dilovaniya xwe. Em bala xwe bidine çend navdarên me kurdan ku bi komplotan

hatine kuştin:

Zerdeşt (B.Z. 583), Dayako (B.Z. 763), Mîr Muhamed (1837), Simko (1930), Yado (1927), Şêx Seîd (1925), Seîd Riza (1937), Elî Şêr (1937), Qadî Muhammed (1947), Îhsan Nûrî Paşa, bi destê Savakê di 1976'an de Dr. Şivan, Faîk Bucak, Abdulrahman Qasimlo û her wiha bi dehan natine kuştin.

Dema ku dijmin dixwaze têkoşînekê rawestîne, an bide şikandin, dixwaze rêberê wê raperînan û têkoşînekê ji holê rake da ku ew têkoşîn were vemirandin. Bêguman rêbertiya Öcalan ji rêbertiyên din di gelek hêlan de cuda ye, pêwîst nake em di vir de van cudahiyan diyar bikin, ji ber ku ji her kesî re diyar in.

Daxwaza min ew e ku gelê kurd nekeve kêmasiyên berê û divê li xwe û rêberên xwe xwedî derkeve. Xwedîderketina dozê, xwedîderketina rêbertiyê ye.



Bêhna fireh

Ger di xudbeya meleyê gundê Stilîlê de, di waz û civînan de, li gersîn û berberoşkan her digotin bêhna xwedê zehf fireh e. Bêhna wî ya teng heftê sal e. Xelîlê Dûnê bi înad û balkêşî li wan guhdarî dikir. Peyva wî dihat heta ber gewriya wî, lê dîsan dadîqurtand; ji ber ku navê Yezdanê dilovan di hate têkilkirin. Ger di dilê wî de hebû ku bersivê li gorî xwe bide, lê nikaribû bi ser navê yezdanê keve û dijberî vê peyva han rabe. Gelek caran xwe amade dikir ku dijrabûna xwe eşkere bike, lê ma civak, ola îslamê, Şêx Xizna, sofîyên

bêmantik û hişkbarerên dorhêla wî. Ji berteka (reaksiyona) wan dipelîkand û bêdeng dima. Rojêkê dîsan Xelîlê Dûnê diçe Derxînê, nava civata Stilîliyan, dinihêre ku Mele Şêxmûs dest bi wazan kiriye û dibêje: "Kuro, Yezdan mîna mirovan nîn e. Bêhna wî zehf fireh e." Bêhna wî ya teng, heftê sal e. Xelîlo nema xwe digire û têkilî peyva Mele Şêxmûs dibe dibêje: "Yezdan yekî bêxem e; tu derdê wî nîn e. Ma wê jîbo çî sedemê bêhna wî ne fireh be. Kesî ku bêhna wî teng bike li mala wî nîn e. Zîkê wî têr e, tengasiya aborî jî nakişîne. Derdê zar û zê-

çan jî pê re tune ye. Mela de ka bibêje bê ma wê bêhna wî ji çî teng bibê?" Mele Şêxmûs dibêje: "Hişkuro. Tu bi van peyvên xwe kufur dibî, dibî file..." Xelîlê Dûnê dibêje: "Na mele, Xwedê ji te razî, ji bo çî ez dibim file; ez rastiyê dibêjim. De ka bila Gozê (jina Xelîlê Dûnê ye) jina wî bûya û ev pite pita ku bi ser min de dike bi ser wî de bikira û bila bêhna wî ev çend fireh bimaya? Ma ez çî bibêjim, yek mîna Gozê bi ser ve nebûye, tu dibêji "Bêhna Yezdan zehf fireh e..."

Î. OMERÎ

Şêxo bazde!..

Li herêma me, demekê şêxek hebûye, navê wî Şêx Bekir bûye. Mirîdekî şêx hebûye, mirîd bi şêxê xwe ve girêdayî bûye. Mirîd û şêx gelekî ji hev hez kirine.

Şêx rojêkê ji mirîdê xwe re gotiye: "Gava ku tu ketî tengasiyê gazî min bike, ezê werim hawara, te da ku te ji tengasiyan xelas bikim." Mirîd bi vê gotinê gelekî kêfxweş dibe û radi-be diçe.

Rojêkê ji rojan ev mirîdê ku me li jorê qala wî kiribû diçe daristanê ku hinek ardûyê zivistanê bîne. Berê erebeyaya ga dide hevrazê, hinek ber bi çiya ve, hildikişe. Ew gava tê nivê hevrazê, dike nake gayê wî êdî nikare erebeyê bikşîne û erebe hêdî hêdî paşûpê tê, xwe dide paş erebeyê, qeweta xwe didê, dîsa jî nikare bide sekinandin. Di wê lazeyê de gotina şêxê wî tî bîrê. Heta ku taqeta wî heye diqire û bang dike:

"Ya Şêx Bekirê Sor, tu werî hawara min, va ye ez ketim tengasiyê, tu werî!"

Di dû vê bangê re jî dinihêre ku hîn jî paşûpê hatina erebeyaya ga nasekine û heke xwe ji rîya erebeyê xwe nede aliyekî, wê di bin erebeyê de bipelixe; ji nişka ve bi bazdan xwe ji rê derdixe û dîsa bang li şêxê xwe (Şêx Bekir) dike:

"Beko bazde erebe hat!"

BELENGAZ

XELAT...

XAÇEPIRSA BIXELAT (20)

XAÇEPIRSA

Serfideki nemiş...	V	Niçe...	X	Gihane...	U	Geyik	K	Muzewî...	R	Mewş...
W	E	W	A	L	V	E	K	O	K	
Rind...	D	E	L	A	L	L	E	H	I	
Heraz...	P	A	L	M	E	L	E	V	A	N
Jin...	T	A	J	A	N	K	A	N	O	
Xweş...	X	A	T	I	D	O	N	T	R	
Mewş...	Y	N	E	S	M					
Ödê...	O	D	E	L	O	M	E			
Paş...	E	N	I	S	K	N	D			

Bersiva Xaçepirsê (18)

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi rîya pişkê li 10 kesan belav bikin. Xelata hejmarê me ya 20'an kitêba **Gürdal Aksoy "Tarihi Yazılmayan Hak Kürtler"**e. **Jêrenot:** Ji bo ku bersiva we bê nîrxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevlî adresa xwe ji me re bişînin.



Şoreşgerê nemir (wêne) Yezdanekî Zerdestiyan	Darek O.Neil (Aktorekî biyan)	Cihê mîşên hingivîn Cînavkek	Gihanekek Naverast	Bersiva neyîniyê Bi zeri ve	Vladimir İliç İlyanov
	3			Navsere pîr	7
Baneşana bang-kirîrê Poşî		Beredayî	1		Xerabeyên li nêzê Qersê
	2	Vexwarina bingehin Eşîrî	Dost (şair) Mixare	
Neteweyên Yekbûyî Yezdanekî Misrê		Cerd. niyd Propagan-da	4		Sembola Nîkelê
	Beyreq Yezdana evîne ya yewnanan		Cihê razanê Rêxistine-ke leşkerî		
Ji nû ve saxbûn Parçe		5		Bi kevanê tê avêtin	
		Xwed-nenas Ajanseke nûçeyan		6	
Makîneya çapê Nasnama Navnetewî					
		8			

Kesên ku xelata xaçepirsa 18'an, kasete "Civata Dengbêja" qezenc kirine: **Tahsin Kutusuz/Hilvan, Serdar Atas/Batman, Rıfat Kaya/ Antep, Bahattin Özdey/ Diyardin, Lezgin Demirel/ Mardin, Tekin Devrim/Aydın, Orhan Yüzal/Mardin, Mahfuza Yıldız/Adana, Murat Yavrutürk/Ankara**



DÛMPASK

* BELÊ... ÇAJAKIYÊN HABITATÊ DESTPÊKIR...



abdiulkadir ÇİÇEK

Auschwitza kurdan: Newala Qesaban

Destpêk rûpel 16

Piştî ku Belediyeya Sêrtê ji destê Mahmut Calapkulu yê ANAP'î kete destê Ekrem Bilekê SHP'yî destpêka 1990 bû. Av. Ekrem Bilek mirovekî demokrat û welatparêz bû. Cara yekemîn bû ku belediye li Sêrtê dike-te destê kurdan, heta wê demê her dem serokên belediye yên Sêrtê ji erebên Sêrtê bûn. Piştî destpêka 1990'an êdî gelê kurd ketibû merheleya guhartineke mezin. Serhildan pêk dianîn, li ber xwe didan û li şehîdên xwe xwedî derdiket. Ango Botan û Xerzan rabûbû ser piyan... Wê demê Serokê İHD'ya Sêrtê Av. Zübeyir Aydar bû. Gelên derdora Sêrtê ji bo wehşeta ku li Newala Qesaban dibû, dengê xwe bilind dikir. Bi vî awayî bi hewldanên birêz Zübeyir Aydar, ji Ewrûpayê komele û komên aşîxwaz, lêkolîner û pazarvan kom bi kom berê xwe dan Sêrtê. Li Ewrûpayê ji bo vê yekê daxuyaniyên çapemeniyê dan û dewleta tirk tawanbar kirin. Mehkeme hatin vekirin. Piştî demekê, ji nav şehîdên bi sedan ji newalê hin cesed hatin derxistin. Bi alîkariya wan saziyan ji bo wan şehîdan li Sêrtê "Goristana Şehîdan" ava kirin, gul û çiçek li ser gora wan hatin çandin. Li "Goristana Şehîdan" navê hin kesan ev in: Dr. Kamuran, Hatim Dağtekin, Ahmet Tayçun, İbrahim Turçak û ji Suriyeyê İsmail...

Bandora Newala Qesaban li ser medya ya cihanê û Tirkiyeyê

Wehşeta Newala Qesaban cara yekemîn, li Tirkiye û Kurdistanê bi saya çapemeniya dijber derket holê. Rojnamevanê kurd ji kovara "2000'e Doğru"yê Günay Aslan di ni-

Wehşeta Newala Qesaban cara yekemîn li Tirkiye û Kurdistanê bi saya çapemeniya dijber derket holê. Rojnamevanê kurd ji kovara "2000'e Doğru"yê Günay Aslan di nivîsa xwe ya di kovarê de, der barê wehşetê de sernavekî wiha diavêje: "Siirt'te insan çöplüğü" (Li Sêrtê sergoya mirovan).

vîsa xwe ya di kovarê de, der barê wehşetê de sernavekî wiha diavêje: "Siirt'te insan çöplüğü" (Li Sêrtê sergoya mirovan) 19 rêbendan 1989.

Ji bilî vê nivîsê çapemeniya tirk guhê xwe ji bo vê wehşetê girt û li gorî wan kuştina kurdan di newalan de bûyerên asayî û ji rêzê bûn...

Lê mirov vê yekê nikare ji bo çapemeniya cihanê re bibêje.

Rojnameya navdar INDEPENDENT'ê di hejmara xwe ya 31'ê rêbendana 1989'an de wehşeta Sêrtê bi sernivîsa yekemîn dide û wiha dibêje: "Butchers river begins to yield its grisly secrets (Newala Qesaban sirên xwe yên bixof derdixe holê)..."

THE GUARDIAN (31 rêbendan 1989): "Kurdish rebel corpses" are left to rot'an rubbish dump (cesedên mîlîtanên kurdan, ji bo rizandinê li ser tingê dihêlin)...

BBC (30-31 rêbendan 1989): Di nûçeya xwe ya yekemîn de şîrove û nixrên Newala Qesaban dike û bi Av. Zübeyir Aydar re der barê vê yekê de hevpeyvînekê pêk tîne...

Ji hêla din Rojnameya The TIMES û ajansa DPA yê ji der barê Newala Qesaban de nûçeyên dorfireh diweşînin...

73 şehîdên ku cesedên wan avêtine Newala Qesaban (1985-1989)

Mehmet Sevgat, Süleyman Erdem, Ur-

fan Alpaslan, Ferhat İl, Cevdet Günerhan, Mehmet Ağarsan, Yaşar Kahraman, A. Mecit Yılmaz, Hamit Avcı, Selman Kara, Celal (kod Halil), Abdullah Acar, Çiçek Selcan, Emin Sarık, Kazım Sürgeç, Fadıl Tunç, Xezal Sevilgen, Donar Akay, Xanim Yaverkaya, Bedri Merwan, Cemil Tunç, Mehmet Sevilgen, A. Kadir Tuncer, Osman Şanlı, Ekrem Güven, Ahmet İbin, Ahmet Ali Demir, Murat Zeyrek, Mehmet Şeyh Gündüz, Adife Sakık, Ahmet Ergin, Hüseyin Yıldız, Ramazan Kaplan, Ali Uğur, M. Sait Yıldırım, Enver Duran, Medeni Keleşoğlu, A. Kadir Bilim, Ahmet Çelik, Hamit Doymak, Zübeyir Yıldırım, Hamit Dağtekin, İsmail (ji başûrê biçûk), Ahmet Taygur, Cemal Tepe, İbrahim Turcak, İrfan Eren, Bedrettin Timurtaş, Ömer Aytur, Ali Kaya, Nurettin Aktay, Vasfi Kılıç, Hamit Bafı, Leyla Dal, Ahmet Aydın, Mehmet Dağ, Kasım Kocaman, M. Aktay, Mahsum Korkmaz, Ekrem Bidal, İbrahim Kurt, Hasan Akan, Ankaralı Mustafa, Sofi Ömer, İbrahim Savaş, Ramazan Erberk, Weysi Yıldırım, Murat Kaya, Nezir Yavuz, Ali Ekrem Bidav, Haydar Uzunyol, Harun Aras, Tekin Sevim.

SALİHÊ KEVİRBİRÎ

Çavkanî: Malbatên M. Sincar û Mehmet Oktay, Kovara 2000'e Doğru, Pirtûka Günay Aslan "Üniformalı Kasaplar (Qesabên bi üniforma)

WELAT

Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
Zerya Basın ve
Yayıncılık
San. Tic. Ltd. Şti. adına
Xwedî (Sahibi)
CELALETTİN YÖYLER

Gerîndeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
MEHMET GEMSİZ

Heyeta Weşanê
(Yayın Kurulu)
AYNUR BOZKURT
SAMİ TAN
RAHMİ BATUR

Berpîrsê Karên
Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
DÜZGÜN DENİZ

Berpîrsê Saziyê
(Müesseses Müdürü)
TAHİR ELDEMİR

NAVNÎŞAN
Ayhan Işık Sok. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL

TEL-FAX
(0 212) 293 53 19,
251 90 13

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.Ş.

BELAVKIRIN
Birleşik Basın Dağıtım
(BBD)

NÜNERÎTİYÊN ME

(Temsilciliklerimiz)

Nimîndeyê Giştî

yê Ewrûpayê:

Mazhar Günbat

Suriye: Jan Dost

Berlin: Silêman Sido

49-30-69002695

Hannover:

Selîm Biçûk

49-5721-81360

Munchen:

Mahmut Gergerli

49-871-670884

Atîna: Ferhan Zêbarî

30-13634905

Bruksel: Medeni Ferho

32-02-466037

Stockholm:

Robîn Rewşen

46-8-7510564

Badenwurttemberg:

A. Rahim Ayaz

49 75 45 91 10 42

Bonn: Ahmet Baraçkılıç

49 228 66 62 49

Hollanda: Remzi İlhan

312 06 32 31 28

Celle: Wezir Saçık

49 50 52 87 36

Auschwitzza kurdan: Newala Qesaban

Newala Qesaban, berê sergo bû, lê niha gora şervanên azadiyê ye. Kes başebaş nizane ku ev der ji çend kesan re bûye goristan. Cara pêşîn laşên şervanên kuştî, di 15'ê gulana 1985'an de li Newala Qesaban tê dîtin.

Newala Qesaban; dikeve nav êrdima bajarê Sêrtê û li ser rîya Şîrwanê bi 5 km'yan ber bi bakur dikeve. Ji ber ku qesabên Sêrtê, hestî-mestiyên sewalên serjêkirî diavêtinê û newal mîna sergoya xwe bi kar dianîn, lewma jî navê herêmê bûye Newala Qesaban. Lê sed mixabin piştî destpêkirina şerê çekdarî ji 15'ê Gelawêja 1984'an û bi vir de, newal ji xeynî qoq û hestiyên sewalan, ji laş û hestiyên ciwanên kurdan re jî dibe cih û war.

Li gorî çavkaniyên herêmî; mêjûya cara ewil dîtina laşên mirovan 15'ê gulana 1985'an e. Di navbera salên 1985'an heta 1991'î li Herêma Botan bi sedan şerwan, welatparêz û mirovên bêguneh hatin qetilkirin, bi panzeran ve hatin kişîşandin û birin avêtin Newala Qesaban.

Di 6 salên wê demê de (1985-1991) kirinên hovane ji hêla fermandariya leşkeriya Sêrtê ve û bi alîkariya Serokê Belediyeya Sêrtê Mahmut Calapkulu ku bi eslê xwe ereb e, dihate organîzekirin. Mahmut Calapkulu Newala Qesaban ji dewletê re tehsîs kiribû, erebe û dozerên belediyeyê ji bo ku laşên mirovên kuştî, biavêjin newalê bi dil û can bi kar dianîn.

Calapkulu her dem ji wan kesên kuştî re digot: "Ew terorîst in, ew ermenî ne û file ne." Mahmut Calapkulu û kurê wî, di sala 1991'an de li navenda Sêrtê ji hêla PKK'ê ve hatin kuştin. Tiştêkî balkêş jî ev e, ku wê demê, ji bo ku kes bi wê rûreşiyê nehese derdora newalê ji "koçeran" re qedexa kiribûn.

Çend portre ji şehîdên Newala Qesaban

Bedrettin Timurtaş (22 pûşper




Ji bo me kurdan/ zaliman lugatek çêkirine/ di lugata wan de/ navê kuştina me kurdan: Paqijî ye./ û tîrbên me yên bi hev re ji/ tim deşt, gelî, çem û newal in/ Li Sêrtê Newala Qesaban/ li Dêrsimê Çemê Munzurê/ Geliyê Zilan/ Newala Qutê/ sî û sê gule/ Çukurca û Helêpçe/ Eyyy Xwedê! Êdî bes e looo!...

1985): Mele Bedredîn ji ber pest û kotekiya dewletê jina xwe û 5 lawên xwe dihêle û dikeve nav refên gerîla. Paşê di 22'ê pûşpera 1985'an de tê kuştin. Ji ber vê yekê bi dehan car dewlet êrîş dike ser malbata wî. Di êrîşeke wiha de zarok ji ber jina wî diçe. Jina Mele Bedredîn li gorî wesiya zîlamê xwe 3 zarokên xwe şandine nav şervanên azadiyê.

Mele Bedrî (Mehmet Oktay): Di sala 1987'an de li nêzikî Qereqola "Çêlikê Eliyê Remo" li mintiqeya Xana Kewê tê kuştin. Ew bi xwe ji gundê Eynê ye, ku li ser Eruha Sêrtê bû. Li gundekî Şîrwanê meletî dikir. Dibistana ewil, navîn û lîse ji derve qedand û ji derve Fakulteya iktisadê (aborî) dixwend. Piştî re bû gerîla.

Gava tê kuştin 3 leşkeran jî dîkuje. Her dem misîn û secadeya xwe bi xwe re digêrand. Ew bi panzereke leşkerî ve girê didin û li navenda Eruhê kuçe bi kuçe digêrin, piştî re dibin diavêjin

Newala Qesaban... Gava ku tê kuştin, çapemeniya tirk, di rojnameyên xwe de manşetên wiha diavêjin: "Meleyê



Şehîdekî ku cendekê wî ji Newala Qesaban hate derxistin, Dr. Kamuran (Fethi Sincar).

PKK'yî hate kuştin", "Mele bêsinet derket" û hwd.....

Adife Sakık (9 adar 1985): Xwişka Sırrı Sakık Adife Sakık û kurmamê wî Murat hatin şehîdkirin. Rayedarên dewletê gotin ku ew kuştî li Amedê binax kirine, lê Sırrı Sakık di daxuyaniyekê xwe yê wê demê de wiha dibêje: "Termê kuştiyên me avêtine Newala Qesaban..."

Urfan Alpaslan (10 kewçêr 1988): Serokê Belediyeya Agiriyê yê berê Urfan Alpaslan û hevalên wî jî piştî ku hatin kuştin, cendekên wan avêtin wê derê.

Dr. Kamuran (Fethi Sincar): Di sala 1991'an de Fermandarê Herêma Botan û birayê Mehmet Sincar Fethi Sincar û hevalekî xwe li Seyfiyê şehîd dikevin.

Dr. Seyfi: Li mintiqeya Mişara Eruhê şehîd dikeve. Wî dev ji doktorîya nexweşxaneyê Mêrdînê berdaye û bûye şervan. Bi eslê xwe Dêrsimî bû....

Dûmahîk rûpel: 15